

Welat

Sal: 2 Hejmar: 89 31 Cotmeh- 6 Mijdar 1993 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Afreta Kurd û Afrodîta Yewnanî

Di Kurmanciya Jêrîn (Soranî) de peyva "afret" di şûna peyva "jin" an jî peyva "pîrek" a Kurmanciya Jorîn de tê bikaranîn. Peyva "afret" bi giştî ji bo zayenda mî ye û peyva "jin" jî, ji bo pîreka zewicandî tê gotin.

Rûpel 10



NÛÇEYA TAYBETÎ...NÛÇEYA TAYBETÎ...NÛÇEYA TAYBETÎ...NÛÇEYA TAYBETÎ...

Dewlet di ber şerê xwe yê bêrêzik de rîyan jî dicerîbine

Dewlet bi Şirnexê re bazarê dike



Dewlet ji aliye kî ve gund û navçeyen Kurdistanê kavîl dike, ji aliye din ve jî dixwaze bi gerîlayan re bikeve bazarê.

Ev du sê hefte ne ku rayedarên dewletê yê Şirnexê, hemû rîyan diceribînin ji bo ku xwe bigihînin berpirsiyarê gerîlayen Şirnexê û bi wan re li ser mi-hendisekî revandî, bazarê bikin. Be-rî mehekê, mi-hendisekî bi navê Mustafa Mungal û karkerekî bi navê Cemil Mağrur ji aliye ARGK'ê ve hatibûn revandin.

Ji bo berdana wan, Waliyê Şirnexê bela xwe ji giregirê Şirnexî venakin, ji bo ku herin bi gerîlayan re bipeyîvin û mi-hendis Mustafa Mungal bidin berdan. Ji bo berdana Mustafa Mungal, ev rayedarên dewletê teklîf û tehdîdîn balkêş pêşkêşî Şirnexiyan dikin.

Rûpel 8



Dewletê dîsa rûyê xwe nîşan da

Navenda Nûşeyan - Şer, bi temamî rojeva Tirkîye û Kurdistanê dagirt. Hêzên ku dewletê pêk tînin, di çare-serkirina pirsgirêka Kurdi de ji du dîtinan, a qetliam û têkbirinê pejirandin. Hêzên ku çareseriya demokratik di-parastin jî, li hember alîgirêne qetliam û tundkirina şer bi ser neketin û ji ber ku nebin sebebê dubendiyekê di nav dewletê de, dengê xwe birrin. Tevî vê yekê li gorî ku rewşa iro diyar dike, çarese-

riya siyasi, her çiqas neye eşkerkirin jî bi temamî ji rojê derneketiye. Ev herdu dîtin bi awayekî veşarî şerê xwe yê li hember hev didomînin. Ev yek di sazî û weşanên Tirk de jî xwe eşkere dike. Li gorî ku tê zanîn, her yek ji wan alîgirê hêzek ji hêzên ku dewletê pêk tînin in. Ji ber vê yekê jî di rastiye de dîtinan ku di rûpelên rojnameyan de şer dike, dîtinan hêzên dewletê yên dijber in.

Rûpel 9

Dewleta Tirk dixwaze Kurden Başûr bi xwe ve girê bide

Tirkîye bi nîn Kurdan dixapîne

Welat/Zaxo - Dewleta Tirk li aliye kî gund û bajarêne bakurê Kurdistanê dide ber bombeyan, dişewitîne û qetliaman pêk tîne, li aliye din nîn û savarê li Kurden başûrê Kurdistanê belav dike û dixwaze wan bi xwe ve girê bide.

Her çiqas gelek caran bi mebesta êrifşbirina ser gerîlayen ARGK'ê Artêşa Tirk gundan Başûr jî bombebaran dike, dîsa jî, ji bo ku gelê Başûr bixapîne xwarinê li wan belav dike. Hefteya cûyi dewleta Tirk şekir, birinc, rûn û şîr li gundê Zaxo belav kirin. Bi navê alîkariya Tirkîye, li gundê Zaxo li serê mi-roveki 5 kîlo ard, kîloyek şekir, yek birinc, yek rûn û nîv kîlo jî şîr hate belavkirin.

Serperîştiya belavkirinê leşkerên Tirk dîkin û hin Pêşmerge jî bi wan re ne ji bo parastinê. Li gor rojnameya Birayetî (weşana PDK'ê) Wezareta Karêne Derve ya Tirkîye, 257 ton xwarina din wê bide gelê Başûr. Li gor Cigirê Wezareta Karê Derve yê Tirkîye heta niha ev alîkarî li 29.000 kesan hatiye belavkirin.

Li aliye din Artêşa Tirk operasyonê

xwe li Başûr didomîne, lê tiştek bi ser tiştekî naxe.

Li gor jêderên girêdahiyê PKK'ê hin-ek niqteyên wan, ji aliye leşkerên Tirk ve li navçeya Heftanîn û Gelyê Spî ya biçuk hatibûn tesbîtkirin û roja 24'ê Cotmehê hezên Komara Tirkîye divîyan xwe nêzîkê wan niqteyan bikin. Lê gerîlayen PKK'ê cihêñ xwe girtibûn û kemîn li ber wan danîbûn. Pişti leşkerên Tirkan derbe ji aliye gerîla ve xwarin erebeyen leşkerî ji Qilaban (Uludere) li hewara leşkeran re cûn. Gerîlayen PKK'ê kemîn di riya wan de jî danîbûn û ketin kemînê, li dora gundê Hîmê 6 erebe isabet girtin û termê 4 leşkeran li dû xwe hiştin.

Ew roj saet li 12'an 2 firokeyen Tirkan û 2 balefirên cengê navçe didan ber gulleyan.

Ziyatê gerîlayan bi tenê 9 kîlo birinc û hin nîsk û hin firaq in ku ketin destê leşkeran. Li aliye din nasnameyên 4 leşkerên kuştî ji hate hînkirin ku, her çar leşker jî tîmîn taybetî ne.

Wiha hatiye wiha naçe

Xebatkar û kedkarêن Welat, tevî hemû zorbazî û pêşlégirtinê li hemberî weşîna rojnameyê, ji ber ku heta niha we weşîna xwe domandiye ez we ji dil û can pîroz dikim. Welat ronameyeke heftane ye, tevî ku me nûçê ji rojnameyên rojane dixwendin ji, me careke din ji Welat ji dixwend. Bi vê yekê nûçeyen cur be cur em ji Welat agahdar dibûn.

Béguman xizmet û vatiniya Welat bes ne ev e. Xizmeta mezin ew e ku, bi zimanê Kurdi té çapkîrin. A-liyê girîng ji ew e ku, bi zimanekî akademik û bi yê çapemeniyê tê pêşkêşkirin. Li gorî min mebesta Welat ji ev e. Eger ez şas nebim di mejiyê Kurd de Welat bûyerike mezin e ku, wê hemû xebatkar, nivîskar û afîrînerên wê di jiyana çapemeniya Kurdi de cihekî rîzdar bigirin.

Nêrîna min ew e ku, riya Kurdan gav bi gav bi ronitir dice. Lewma ku mirovîn Kurd ji xwe baş nas dikan, di vê pêvajoyê de para Welat pirr bi bal e û înakî ji ne mimkûn e.

Min gelek ji Welat istifade kir. Ji ber vê yekê ji gişt afîrînerên Welat re gelek spasdardar im. Divê vê mijarê hinek eşkere bikim. Lewre ez pêwist dibînim û heta bila ji xwendevanê Welat re bibe wekok ji. Ez zarokek bajarı me. Dê û bavê me ziman hîni me nekiribûn. Kesêni li

hawir û cînarê me bi Kurdi biaxive ji nîn bûn. Li gorwan ji zimanê Kurdi ji me re ne pêwist bû û jîxwe zimanekî kevnare bû. Lî hem dê û bavên me û hem ji cîranê me rind bi Kurdi zanibûn. Bêşik ev rewş ji zilm û pêkutiya dewletê qewimîbû. Pest û tirs ji wê caxê ve didome. Wek tê zanîn pest û tirs berhemâ konevaniya (siyaset) înkariyê ye. Ji ber vê ye em hîni zimanê xwe nebûn.

Îro pest û pêkutiya dewletê dijwarîr didome. Lî gelê Kurd ji tîrsa xwe avêtiye, xwedî hişê bilindir bûye. Di gel vê hindê rexnekirina nîşen çûyi edî bêfeyde ye. Rehme li hemûyan be, ci bû bûye.

Di dawiya van rewşan de Kurdiya me ji, ji xeziyeke pirr kêm pêk hatiye. Em ji zêde tênegihîstibûn ku nezanîna ziman çiqas kemasî û şerm e. Car carina li hember hevalan ez şermezâr dîmam. Lî wiha nedibû. Çare ci bû? Nêrîna min ew bû ku "Wiha hatiye lî wiha naçe." Çareya min bibe bibe Welat bû. Heke min piçek hewl bida xwe hindik bûya ji minê bikariya binivisanda û biwxenda.

Qabiliyeta axaftina min hê geş nebûbû. Dem bi dem rengê pêkenîyan ji, ji axaftinê min çedibûn. Ez ji, ji wê gavê ve bi alîkariya Welat dixebeitim ku ji nêzîk ve zimanê xwe binasim.

Di vê qonaxê de hogir û hevalen min ev sê hêman bûn: Welat, Ferhenga D. Îzoli û pirtûka réziman a Celadet Bedirxan. Ez bi wan xebitîm û min wextê xwe dağırt. Edî hûnê li quisûra min nenêrin. Bi rastî di hewisîna ziman de qabiliyeta min ne pirr e.

Em dizanîn ku herkes li gorî devera xwe hîni ziman dibe û diaxive. Zimanekî hevpar pêk nehatiye, me bi zimanê xwe hêvotin, dibistan, rojname, pirtûkxane nedîtine. Ev mijûlî bi Welat dest pê kiriye dibe ku di vê çaxê de zimanê hevpar ji pêk were. Niha riya ku Welat vekiriye eme ji tê de biçin ta ku em bigihin zimanekî hevpar.

Di vê dema gelek kurt de huner û serkeftina me ew qas e. Rê û bergeha ku Welat ji me re vekiriye, ez ji hêdî hêdî tê de dimeşim. Ez bawer dikim ku hewes û xîreta min ji gelek kesan re wekok e.

Béguman ku nameya min ger baş, rind û bi mane hate ditin û weşandin ji bo min ne xem e. Kemasî û xelitiyên min hûr mûr e, lazim e ku werin rastkirin.

Daxwaza min ew e ku, Welat xebatên xwe bi pêş ve bibe, xuyaye ku çiqas barênen wan giran e. Dîsa ji ber xîret û hewlîn we ez we pîroz dîkim. Serfiraz bimîn.

Güven Özata / Antalya

Li Tirkîyeyê çapemenî ne azad e

Li Tirkîyeyê demokrasî tu ne û azadiya çapemeniyî ji nîn e. Ev ji her hêlén dewletê û ji hêzên wê kifş e. Ez sedemîn wê ji, ji we re bibêjim. Xebatkar û belavkarên rojnameya Gündem'ê tê tehdîtkirin. Ji ber ku Gündem her tişte xwe raste rast dînîvisîne û ev ji li xweşa dewletê nayê. Çima li xweşa wê nayê? Ji ber ku pîsîti û gemariya wê derdikeve rastê û xelk wê nas dike.

Çima li ser rojnameyên din wisa tehdît çenabin? Ji ber ku li gorî dilê dewletê dînîvisînin, virr û derewên wan belav dîkin. Di gotinê xwe

de dibêjin ku li Tirkîyeyê demokrasî heye, herkes azad e, herkes dikare bi zimanê xwe mijûl bibe, kultura xwe bidomîne, fikra wî/wê ci be bibêje. Lî dema ku em rojnameyeke bi Kurdi dixwînîn têne girtin û işkence li me tê kîrin. Ji tîrsa ku em neyên girtin vê care em Gündem'ê dikirin, dîsan em ji wan naflîtin. Vê care gef li me têne xwarin, ji bo ku em Gündem'ê nexwînîn. Ji me re dibêjin ku, ev rojname ya Ermenîyan e, vân nexwînîn. Ma hûn Ermenî ne, dibêjîne me

Ev rojname hîc ne yêñ Er-

menîyan e û em ji ne Ermenî ne. Ji ber ku Ozgür Gündem û Welat rojnameyên Kurdan e hûn me tehdît dîkin û li firoşkar û belavkarênen me gefan diwxin û wan diku-jin. Lî ev tiştu car nikarin me bidin sekinandin û dê tim wan bixwînîn. Em dê tim doza xwe bimeşînin. Rojnameyên me kelemîn di çavêndijmin de ne û şûren di zen-giloka wan de ne.

**Li ser navê birek
welatparêz
Şewketê Malaşafoyî
Kanîberazan**

Nûçeya Welat em êşandin

Niha rojnameya Welat -hejmar 88- kete destê me û bi meraqa xwendinê me çavêñ xwe lê gerand. Lî hema di rûpela yekemîn de sernîvîsa "ARGK'ê generalek kuş" dile me sar kir. Ji ber ku hêzên artêsa me qet li rûbarê (dorhêla) bûyerê tune bûne û general bi destê dewletê bi xwe hatiye kuştin. Ji ber ku li pêş çavêñ raya giştî ya cîhanê rûyê xwe yê reş eşkere neke û ji qetilkirina gel re bike sebeb, ew ji li dû T. Ozal û Eşref Bîtlîş şandin.

Em bawer in ku, hûn bi xwe ji pê hesiyane û hûnê rexneya me bipejînîn.

Dîsa em dibêjin ku, em bi xwendina rojna-

meya Welat pirr kîfxweş in û ji we re sekefîtin dixwazin.

Bi silavên şoresherî.

**Ji kome xwendevaên
Welat ên li Holandayê**

Nîşeya Welat: Büyera kuştina General Bahtiyar Aydin roja
22'yê mehê pêk hat û rojnameya me ji roja inê 22'yê mehê dikeve çapê.
Ji ber ku agahi dereng gîhişte me û wextê me tune bû, nûçê li gor agahiyênu ku ji a-jansan gihiyabûn me hate amadekirin
Rastiya bûyerê ji piştî bi rojekê derkete holê.

Nivîsara Welat

Pêvajoyeke hesas

E m di pêvajoyeke dijwar û hesas re derbas di-bin. Firehbûn û bihêzbûna têkoşina gelê Kurd dewleta Tirk dixe nav tirseke bêtârif. Bi vê tîrsê, edî berjewendiyê xwe ji baş nikare bifikire û dide navê. Biryar û kîrinê rayedarên dewletê, di nav giyaneke bi hêrs û tirs de tê pêkanîn. Di giyaneke wisâ de biryarê tê standin bêmeji, bêqeyde û hovane ne. Béguman bi biryarê ku di dema çavşorîyê de tê standin tu pirsgirêk çareser nabin, tevlihevî û hovîti xwe nîşan didin.

Bi vê tewra bêsiyaset û bêmeji hem gelê Kurd hem ji yê Tirk pirr dicesire. Dîsa béguman ev helwest wê dawî li vê sistemê bîne, lê di ber xwe re ji wê texribatên mezin çêbike di civakê de. Tişte dikeve ser milê kesen rewşenbir û şoresher, kêmkirina vê zîrare û bi siyaset û bimentiq bersivandina tewra vê dewleta bêrêzik e.

**Tişte dikeve ser milê
kesen rewşenbir û
şoresher, kêmkirina vê
zîrare û bi siyaset û
bimentiq bersivandina
tewra vê dewleta bêrêzik
e. Ji ber vê helwesta
dewleta bêrêzik û
dijmirovî, pêvajoya em tê
de ne pirr hesas e. Ev
dewlet çiqas bêsiyaset û
bi hêrs bilive pêwist e
berevajî em ji ew cend bi
siyaset û di nav giyanekî
hêsan û rehet de bifikirin
û biryarê bi mantiq
bistînin û bi bîr û bawerî
bimeşin.**

Ü bi siyaset û bimentiq bersivandina tewra vê dewleta bêrêzik e. Ji ber vê helwesta dewleta bêrêzik û dijmirovî, pêvajoya em tê de ne pirr hesas e. Ev dewlet çiqas bêsiyaset û bi hêrs bilive pêwist e berevajî em ji ew cend bi siyaset û di nav giyanekî hêsan û rehet de bifikirin û biryarê bi mantiq bistînin û bi bîr û bawerî bimeşin.

bawerî bimeşin.

Dewlet her diçê dev ji formalîteyê demokrasiyê ji berdide. Berê ji demokrasî tune bû, bes ji bo xwe li raya giştî paqîj û rûspî nîşan bide, car caran hin formalîte dianîn cih. Lî xuyaye edî daye navê û dev ji nezaketê ji berdaye. Berê xwe daye saziyên legal û dixwaze wan yek bi yek bi awayekî ji holê rake. Ji vê tewrî rojnameya me ji para xwe distîne.

Her cendî dewlet rojnameya me raste rast nagire ji, bi awayen din rî li ber firotin û belavbûna wê digire. Li gelek deveran pirr kes çîma ku Welat dixwînîn têne girtin, tehdîtkirin û işkenceyê sosret li wan dibin. Zehfîn bayiyan ji ber vê yekê Welat bi eşkere nafigosin. Bes ci dibe bila bibe eme Welat derxînîn, bifroşin û belav bikin.

Tişte pêdîviya me pê heye alîkarî û piştigiriya xwendevanê me ye. Ji bo ku kesen dixwazin rî li ber me bigirin negihêjin armanca xwe em xwendevanê xwe careke din dawet dîkin ku li Welat û hemû berhêmîn xwe xwedî derkevin. Mesela wek destpêk, her xwendevanê me dikare bayiye nêzîkî xwe kontrol bike, ka Welat difiroşe an na. Weki din em wan vedixwînîn ku bibin aboneyen Welat û di pey re ji aboneyen din ji Welat re bibînîn. Welat rojnameya me ya yekanê ye, em lê xwedî derkevin.

Ferhengok

Benc: Narkoz

Bijûn: Dahat (verim)

Bizav: Tevger

Dahata: Neteweyî

Hasila milî

Dana: Hekim

Danayî: Hikmet

Diravdanî: Tehsîsat

(Ödenek)

Fergeh: Dibistan

Fêrgeha Seretayî: İlk

Okul

Fêrgeha Navetayî: Orta

Okul

Fêrgeha Kutayî: Lîse

Hawirde: İthalat

Hilco: (Aski)

Hinarde: İhracat

Hîwer: Hevling, bacanax

Kewşen: Sînor, tixüb

NÜÇEYÊN CENGË

Livbaziyê ARGK'ê xurt dibin

Hêzên dewletê li ser xurtbûna êrîşen ARGK'ê dest bi qetliaman kirin. Li Licê operasyoneke dorfîreh pêkanîn û bi sedan mirov kuştin. Servanê ARGK'ê vê hefteyê jî êrîşen xwe li ser avahiyê hêzên dewletê û dezgehê fermî zêdeki-rin.

21 Cotmeh 1993: Hêzên dewletê navçeya Licê dane ber gulebaranî. Jinek mir û 2 kes jî birîndar bûn. Li Dêrsimê li navçeya Nazimiyê ew polisên ku hatibûne revandin. laşê wan hate ditin.

Gerilayê ARGK'ê avêtin ser navçeya Dûtaxê ku li ser Agiriyê ye, gelek avahiyê fermî û yên leskeriyê hilweşandin. ji aliye kî din ve jî gerila cerdi gundê navçeya Dûtaxê kirin 10 dibistan şewitandin.

Li Agiriyê nêzî navçeya Pat-nosê gerilayê ARGK'ê kontrola nasnameyan kirin. di navbera hêzên dewletê û gerilayen de şer derket. Pişti bûyerê hêzên dewletê li herêmê sewqiyeteke mezin bi rê xistin. çuyîn û hatin dane qedexekirin. Di wan saeten de komek gerilayen din jî li herêma Bûrûnbûlaxê kontrola nasnameyan kirin. di navbera gerila û tîman de şer derket. Der barê mirî û birîndaran de tu agahî nîn e. Li herêmê sewqiyat çedîbin.

Li Şîrnexê li navçeya Cizîrê gundê Karûxê, hêzên dewletê gundi li holê li hev civandin û dest dan ser nasnameyen wan.

22 Cotmehê 1993: Gundê Milo û Zozanê Şîkarîn ku li ser navçeya Sertê Hewêlê ne. gerilayê ARGK'ê avêtin ser wan. Di navbera wan û cerdevan de şer derket. 22 kes hatin kuştin û 8 kes jî birîndar bûn. Pişti bûyerê cerdevan avêtin ser navçeya Hewêlê gelek avahî û dezgehê kar xesirandin.

Gerilayê ARGK'ê li gundê Dadasê ku li ser navçeya Amedê Hezroyê ye, 6 kes revandin.

Li Amedê li navçeya Farqînê konvoyeke leşkeran a li ser Tabûra Hilîliyê ku. ji 3 erekbeyan ve pêk dihat. kete kemîna gerila û jê 2 "astsûbay", "çawîşeki pispor" û 9 leşker kuştin. Gelek jî birîndar çebûn. du erekbeyen konvoyê jî xesirin.

Qereqola Parkê ya ku ji Dêrsimê 5 km dûr e. gerila avête serê. Jê 5 leşker kuştin.

Li gorî KURD-HA yê gerilayê ARGK'ê êrîş birin ser komek leşker ku girêdahi navçeya Cûlemêrgê Qîlibanê ye. 40 leşker hatin kuştin û 10 leşker jî birîndar bûn. Di bûyerê de 2 gerîla hatine kuştin.

23 Cotmeh 1993: Cerdevanîn êrîş birin ser gundê Licokê ku li ser navçeya Licê ye. bi navê Hayali Zengîn cerdevanî kuştin û 16 kes jî revandin. Di bûyerê de 11 mal şewitîn. Gerilayê ARGK'ê li Batmanê 5 endamên kontrgerîla kuştin.

24 Cotmeh 1993: Li Cûlemêrgê gerilayê ARGK'ê êrîş birin ser Qereqola Kavalê. 12 leşker û 6 cerdevan kuştin û di bûyerê de jî gerilayek hate kuştin.

Gerila li Mêrdinê li Kerboranê avête ser Tabûra Jendirmeyan. 2 "astsûbay" kuştin û gelek leşker jî birîndar kirin.

Gerilayê ARGK'ê li Sertê li navçeya Berwariyê li herêma

gundê "Doğanca" yê ji leşeran re kemîn danî û di bûyerê de 5 leşker hatin kuştin.

4 dibistan li navenda patnosê û li gundê dorhhelê ji aliye gerila ve hatin şewitandin. Minibûsa PTT'ê ya ku diçû navçeya Dihê ya Sertê, ji aliye gerilayen ve hate şewitandin û 3 karkeren PTT'ê jî hatine revandin. ERNK'ê li Amedê li Taxa Baxlarê molotofek avêtin Liseya Birlikê û ew xesirandin.

Gerila riya di navbera navçeya Elezîzê Madenê û navçeya Amedê Erxenê birî û otobesa ku guh neda ferma gerila, hate xesirandin. Bi navê Kerîme A-dâşî kesek mir. 7 kes jî birîndar bûn.

Li gundê "Alinca" û "ostan-kaya" ku li ser bajarê Mûşê navçeya Melazgirê ne. gerîla 2 dibistan şewitandin.

Li navçeya Elezîzê li Qereqo-çanê gerila cerdi ser şantiyeya barajê kir. jê mihindizek. 3 opa-ratör. 2 teknisyen 8 kes kuştin.

Leşkeren ku li Dêrsimê li navçeya Xozadê di daristanê de dar dibîrin. ketin kemîna gerîla jê 3 leşker hatin kuştin.

Gerilayê ARGK'ê riya navbera Pûlûrê û Xozadê birî. 4 kesê ku lêzimên cerdevan bûn hatin revandin.

Li bajarê Elezîzê li navçeya Qereqo-çanê di navbera hêzên dewletê û gerilayê ARGK'ê de ser derket. 4 gerila hatin kuştin.

Leşkeren ku li Dêrsimê li navçeya Xozadê di daristanê de dar dibîrin. ketin kemîna gerîla jê 3 leşker hatin kuştin.

Gerilayê ARGK'ê riya navbera Pûlûrê û Xozadê birî. 4 kesê ku lêzimên cerdevan bûn hatin revandin.

25 Cotmeh 1993: Di navbera hêzên dewletê û gerilayê ARGK'ê de li Agiriyê li navçeya Bazidê şer derket. di bûyerê de serbazek. çawîşeki pispor. 2 leşker hatin kuştin. 17 leşker jî birîndar bûn. Li Wanê li navçeya Gevaşê li gundê Koçekê di navbera cerdevan û gerilayen de şer derket. der heqê kuşti û birîndaran de agahî nîn e.

3 gerila li Darahê ya Çepeçürê di şerê navbera leşker û gerilayen de hatin kuştin.

26 Cotmeh 1993: Di navbera hêzên dewletê û gerilayê ARGK'ê de li Agiriyê li navçeya Bazidê şer derket. di bûyerê de serbazek. çawîşeki pispor. 2 leşker hatin kuştin. 17 leşker jî birîndar bûn. Li Wanê li navçeya Gevaşê li gundê Koçekê di navbera cerdevan û gerilayen de şer derket. der heqê kuşti û birîndaran de agahî nîn e.

Depoya TEKEL'ê ya li Bat-

manê ji aliye gerilayen ve hate şewitandin. Di navbera navçeyen Mûşê Kop û Melazgirê de gerîla birî û dest da ser nasnameyan. Li Kopê gerilayê ARGK'ê kepcyeke kargeha şekir şewitandin û şofêrê kepcyejê jî bi xwe re birin. Kamyoneke kargeha şekir a Mûşê ji li cihêkê din şewitandin. Gerilayê ARGK'ê érîş birin ser Tabûra Deştanê ya sînor ku. li ser navçeya Cûlemêrgê ya Çelê ye. Di navbera hêzên dewletê û gerilayen ARGK'ê de şer qewimî, li gorî agahiyê fermî 11. li gorî agahiyê fermî 26 leşker hatine kuştin. Gerilayê ARGK'ê cerdi ser navçeya Şîrnexê Elkê. 10 malê cerdevan û 2 erekbeyen wan şewitandin. Di bûyerê de 10 leşker jî hatin kuştin.

Li Amedê li navçeya Bismilê gerilayê ARGK'ê avêtin ser gundê Qeynê. 2 mamoste kuştin. Pişti çuyîna gerila, hêzên dewletê êrîş birin ser gund. Li gundiyan tehde kirin û gund şewitandin.

Li gorî agahiyê KURD-HA yê hêzên dewletê li herêmên Mûş. Çepeçürê û Amedê ku

çend roj in 45 gund şewitandine.

Hêzên dewletê li Cûlemêrgê 8 cerdevan xistin bin çav û li wan işkence kirin. Gerilayê ARGK'ê érîş birin ser Tabûra Deştanê ya sînor ku. li ser navçeya Cûlemêrgê ya Çelê ye. Di navbera hêzên dewletê û gerilayen ARGK'ê de şer qewimî, li gorî agahiyê fermî 11. li gorî agahiyê fermî 26 leşker hatine kuştin. Gerilayê ARGK'ê cerdi ser navçeya Şîrnexê Elkê. 10 malê cerdevan û 2 erekbeyen wan şewitandin. Di bûyerê de 10 leşker jî hatin kuştin.

Li Amedê hin kes bombe avêtin qehwexaneyekî, di bûyerê de 9 kes birîndar bûn.

Gerilayê ARGK'ê cerdi ser Avbenda Göksuyê ya Çinarê. karker li hev komkirin û bi wan re axivîn, di dawiyê de makîneyen kar ên barajê şewitandin.

Hinek avahiyê DSİ'ye ji aliye gerilayen ve hate şewitandin. Erebeye ku diçû gundê Ridvan û Kûmê ku niha li ser navçeya

Batmanê Beşîriyê ne li mayînê qelibi 2 kes mirin.

ser navçeya Amedê Pasûrê ye. gerilayen avête serê. 4 mamoste dane ber gulebaranê, jê 2 mamoste hatin kuştin ên din jî birîndar bûn.

Li Bîlisê gundê "Dûzköy" û "Yolalan" û bi êrîşen gerilayen ARGK'ê 4 mamoste û kesek hatine kuştin.

Ajansa KURD-HA daxuyand ku li Mêrdinê li navçeyen Dêrikê û Qoserê di navbera hêzên dewletê û gerilayen de şer derketiye, 6 polis hatine kuştin. Li Qoserê ji panzereke polisan hate xesirandin û 2 polis hatine kuştin.

Serokê Belediye gundê "Se-rînava" yê ku li ser Mûşê ye û tevi bi çar mamosteyan ve ji aliye gerilayen ARGK'ê ve hatin revandin.

Gerila 5 kes li bajarê Mherdînê li gundê Şatehê kuştin.

9 gund Li navçeya Elkê ya Şîrnexê ji aliye hêzên dewletê ve hatin bombekirin. 2 zarok birîndar bûn û 200 pez jî telef bûn.

Hêzên dewletê çar roj e ku li Çiyâyê Çemcê operasyonan pêk tînin, ji Qersê gelek leşker hatine cihê operasyonê. Operasyon derbasî navçeya İdire Qulpê (Tuzluca) dibin.

Hêzên dewletê Agirî û Tendû-rek didin ber bombeyan. Di van êrîşen de çekên cuda cuda têne xebitandin. Li herêmê di navbera gerila û hêzên dewletê de şer derket, der barê kuşti û birîndaran de agahî nîn e.

Gerilayê ARGK'ê li ser riya Bîlis û Wanê 2 otobes şewitandin.

27 Cotmeh 1993: Li Cûlemêrgê li navçeya Geverê pişti êrîşa bi bombayan, hêzên dewletê gelek kes xistin bin çav.

Li Amedê li navçeya Bismilê gerilayen ARGK'ê avêtin ser gundê Qeynê. 2 mamoste kuştin. Pişti çuyîna gerila, hêzên dewletê êrîş birin ser gund. Li gundiyan tehde kirin û gund şewitandin.

Li gorî agahiyê KURD-HA yê hêzên dewletê li herêmên Mûş. Çepeçürê û Amedê ku

çend roj in 45 gund şewitandine.

Hêzên dewletê li Cûlemêrgê 8 cerdevan xistin bin çav û li wan işkence kirin. Gerilayen ARGK'ê érîş birin ser Tabûra Deştanê ya sînor ku. li ser navçeya Cûlemêrgê ya Çelê ye. Di navbera hêzên dewletê û gerilayen ARGK'ê de şer qewimî, li gorî agahiyê fermî 11. li gorî agahiyê fermî 26 leşker hatine kuştin. Gerilayen ARGK'ê cerdi ser navçeya Şîrnexê Elkê. 10 malê cerdevan û 2 erekbeyen wan şewitandin. Di bûyerê de 10 leşker jî hatin kuştin.

Li Amedê hin kes bombe avêtin qehwexaneyekî, di bûyerê de 9 kes birîndar bûn.

Gerilayen ARGK'ê cerdi ser Avbenda Göksuyê ya Çinarê. karker li hev komkirin û bi wan re axivîn, di dawiyê de makîneyen kar ên barajê şewitandin.

Hinek avahiyen DSİ'ye ji aliye gerilayen ve hate şewitandin. Erebeye ku diçû gundê Ridvan û Kûmê ku niha li ser navçeya

Batmanê Beşîriyê ne li mayînê qelibi 2 kes mirin.

HAWAR

Dilbixwîn

Hamid Bedirxan û çend keliyên hevdîtinê

Tebaxa 1990'î ber bi dawiya xwe ve diçû. Bi zefer û serkeftineke pîroz rahêştibû koça xwe û berê ker-wen (kerwanî) dabû berbanga 1991'ê. Tebaxa me ya bedew di 91'ê de jî pişti şes salan ên şer, serhildan û raperînan ji bo parastina azadiya gelê Kurd xwe amade kiribû.

Roj çûbû ava, hêdî hêdî stêrk derdiketine meydanê û li ber dengê bêdengiyê dîlan digirtin û govend digerandin. Ez li bajarê Kobaniyê bûm. Hevalên zarokatî û ciwaniyê, dost û nas hatibûn seredana min. Demek derbas bûbû ku me hev nedîtibû. Weke her carî disa me şefaq bi dest xwe re ani; sevbuherkeke wisa şîrîn bû ku, mirov tu caran nikare ji bir bike.

Hevalek pirtûka "Şeva Hicranê" ya hozan Hamid Bedirxan da dest min û got: "Nû ji çapê derketiye. Helbestên ciwan tê de hene. Mirov dikare bixwîne." Min ji hevalê xwe yê ku pirtûk dabû destê min pîrsî: "Gelo, dîsa weke "Li Ser Riyen Asiya" em ji bir kirine? "Bersiva min da û got: "Hamid naxwaze tiliya xwe bide ser birînê, bêguman sedem hene, lê ez hîna li ser sedem û egeran nefikirî me."

Serê sibehê min xatirê xwe yê dawiyê ji her kes xwest. "Edî em careke din hev nabînî" diya min digot. Her kes digiriya, lê di giriye wan de kenê azadiyê hebû.

Ji Kobaniya Akif, Firaz û Dicleyan, min berê xwe da Efrînê. Di navbera Kobanê û Efrînê de nêzîki 300 km he-ne, 300 km'yên wan deran geleki dirêj in. Li Helebê min hevalek dît.

Bala wî ji weke ya min li ser wêje û hunerê hebû. Wî cihê Hamid Bedirxan nas dikir. Em ji stasyona Helebê bi rê ketin, min ji bo hevpeyvinê qaseteke 90 deqiqeyî kirî. Di çenteyê min de Rêwseña YRWK'ê ji hebû, hejmara 2'an bû. Lî bawer bikin min wê demê tiştek jê fêm nedikir. Wê hengê xwen-

dina wê weke niha ne hêsan bû. Lewma ji gelek caran min dilê xwe li sernivisara wê teng dikir.

Em pişti nîvro gihiştin Efrînê. Otobesa me pîr bûbû. Bi rê ve em sê caran ji wê peya bûn, carekê tekel teqîya, carekê ji xwe ber vemir û cara din jî kontrola polisan hebû û li dawiyê bi selameti em gihiştine Stasyona Efrînê. Wê demê stasyon li rex qereqolê bû, niha nizanim li cihê xwe ye an na.

Hamid Bedirxan ne li navenda Efrînê bû. Ew li Şîl Şêx Alhadî bû. Otobesa şîl berî em bigihêni bi deh deqiqeyan rabûbû, em neçar man ku otomobile dostekî bibinî.

Bi otomobile welatparêzekî me xwe berda nava ci-yayen Efrînê. Daran zeytûnê çiya xemîlandibûn. Pozê Çiyayê Hawarê di nava mij de winda bûbû. Xuşe Xuşa Ava Reş xwîna mirov bi ser xwe de dikeland. Em di nava wê bihuştê (cenetê) re derbas bûn.

Bi şev em li ber deriyê Hamid Bedirxan bûn. Dema ku em dîtin, rawestiya û pîrgîni me hat: "Hûn bi xêr hatin."

Em derbasî hundir "odeyekê" bûn. Ode ji pirtûkan da-girtibû, lê hema ne tenê pirtûkxane bû, her tişt di nava hev de bû. Bawer bikin eger bayekî xurtbihata wê ew o-de û yêne tê de bidana ber xwe. Tu nema bû ku pirtûk bi ser hev di hilweşiyana.

Min got: "Eger weke Cahiz tu jî di bin pirtûkan de bimînî, wê encam ci be?" Keniya û got: "Pirtûkên min weke yêne Cahiz ne giran in. Tiştek bi min nayê."

Pirsâ ku ji min re bûbû meraq, min jê pîrsî: "Tu ji vir diçî li Afrikayê, li nexweşekî digerî ku li ser helbestekê bini-visi, lê hema Kuştiyê Kurdistanê nabînî, çima?" Bersiv da: "Ji ber ku ez bi Kuştiyê Kurdistanê re tême kuştin.."

Bedirxan ne hiş ku em dengê wî bigirin. Girtina deng qedexe bû. Min tiştek ji jiyana wî fêm nekir. Pişti ku nîvê şevê derbas bû, wiha gote min: "Kurdâyîtiye pîr nedîn pêş, hûn ciwan in, li ser internasionalizmê bisekinin."

Îngilîz ji aştiyê re derî venakin

Nûçeyen Derve- Şerê ku IRA (Artêşa Komara Îrlan-dayê) dimeşine, di van rojêndawîn de gîhîst eradeyeke li-hevkrinê. IRA ji bo rawestandina şer, nasîna hin mafê neteweyî û nasîna mafê çarenûsê dixwaze. Hikûmeta Îngiliz jî, ji bo destpêkirina guftûgoyan serté çekdanînê pêşkêş dike. Dema ku iñfîmala aştiyê xuyabû, hinek iñisîyatîfê aştiyê derketin holê. Livbaziyên loyalistan (wek cehşen Kurdistanê) li hember mirovén sîvîl pêl da. Çend heftê berê Serokê Partiya Ked a Sosyal Demokrat John Hume, iñisîyatîfe aştiyê pêk anî. Şaxê IRA'yê ya legal Sînn Fein'ê piştgiriya vê xebatê kir. IRA'yê jî bi belavokekê piştgiriya vî karî kir. Li hemberî xebatêni bi vî rengî, helwesta dewleta Îngiliz bi giştî ne neyînî bû, her ciqas Serokwezir daxweza xwe ya her car dianî ziman jî, bi çavekî nebaş li wan xebatan nedinêrî, ji ber ku, raya giştî edî aşti dixwest, livbaziyên loyalistan pêl dan. Heta wê rojê komeleya loyalistan, Komeleya Parastina Ulsuterê(UDA) û şaxê wê yê çekdar, Serkarê Azadiya Ulsuterê(UFF) berê xwe nedabû endamên SDLP'ê piştî 7'ê Cotmehê ku xebatêni vê partiyê ji bo aştiyê li dar ketin, li dijî endamên vê partiyê jî livbazi pêk anîn. SDLP ji partiyekî netewekar a Îrlanî ye, dixwaze ji kesen katolik ravan bisîne, lê li dijî livbaziyên çedarî derdikive. Li go-

IRA gelek caran destê xwe ji bo aştiyê dirêj kir, lê hikûmetê bersiv neda an jî red kir, bi ser de jî livbaziyên loyalistan (cehşen Îrlanî) ên li dijî mirovén katolik ên sîvîl zêdetir bûn. Niha jî hikûmeta Îngiliz, livbaziyeke IRA'yê wek navgîneke râlibergirtina aştiyê bi kar tîne.

rî rayedarêni vê partiyê ji ber livbaziyên IRA'yê hikûmeta Îngiliz nêzî protestan dibe. Wek tê zanîn hikûmeta Îngi-

der e. Loyalistên ku serxwe bûnê naxwezin jî, protestan dibe. Tîrsa wan a mezin Îrlan-dayeke eya 1993'yan bi ser-

mirován bikuje, tenê hêzên dagirkir û hevkarêni wan dikuştin. Roja 23'ê Cotmehê bi livbaziyeke IRA'yê ev rews



Piştî rûxandina vê avahiyê bi destê IRA'yê endamên UFF'ê du karker kuştin.

liz şerê IRA'yê wek şerê li dijî protestan nîşan dide, ji ber ku gelê bakurê Îrlan-dayê bi piranî katolik e û IRA jî li wir di nav gelê katolik de xurt e. Jixwe cihe ji aliyê Îngilizan ve dagirkirî jî ew

bixwe û yekgirtî ye. Ji 3'ye Çile vir ve zêdetir 30 mirovén sîvîl û bégune ji aliyê wan ve hatin kuştin.

Demeke dirêj bû ku IRA'yê bi giştî berê xwe da bû nîşangehên aborî, nedixwest

guherî. Gerîlayen IRA'yê ji bo tolhildanê li Belfestê, li ser kolana Shankill'ê bombe avêtin dikanekî masifiroşan ku navende loyalistan li ser bû. Di vê bûyerê de du kes jê zarok, yek jê şervanê bom-

beavêj ê IRA'yê, 10 kes mirin û nêzî 50 kesan jî birindar bûn. Ji loyalistan kes nemir. Endamekî UDA'yê yê kevin Ken Kerr da xuyan ku, berî wê bi 45 deqiqeyan li wir civîna wan (loyalist) hebûye, lê ji ber ku civîn belavûye, kes ji wan nemiriye. Piştî bombeteqandina IRA'yê loyalistan ji bo tolhildanê berê xwe dan mirovén katolik ên sîvîl.

Her ciqas IRA piştî bûyerê ji bo mirina mirovén sîvîl xemgîniyâ xwe bi belavokekê ilan kir û Serokê Sînn Fein Gerry Adams li livbaziyê rexne girt jî, desthilatdarêni dewleta Îngiliz ev bûyer wek navgîneke ji bo râlibergirtina aştiyê bi kar anî.

Serokê SDLP'ê John Hume livbaziyê wek derbeyeke mezin ku li pévajoya aştiyê ketîye nirxand û wiha got: "Divê Gerry Adams vê bûyerê protesto bike, ger ku tiştên berê gotibûn rast bin." John Hume wiha domand: "Ev bîst sal in ku em li dijî serr in. Divê herkes hewl bide xwe ku ser raweste, ez bawer dikim riya diyalogê zerarê nağîhîne tu kesî, Bang li wan dikim, bila ser rawestin." John Hume daxuyand ku dê hewldanen wan ên ji bo aştiyê bidomin.

Katolikên Ardoynayê ji livbaziyê wiha dinirxînin: "Her ciqas mirina mirovén sîvîl û zarokan ne tiştekî baş be jî, ev şer e, di şer de gelek mirov bi destê loyalistan bi awayekî hov hatine kuştin û hê jî kuştin didomin."

Ji çapemeniya biyanî

Nêçîra xezala spî

Nêçîrvan bi xwe biryara kuştina sewalan satandîne. Panzdeh mîr li Mötteruds (bajareke Swêdê) li hezar donim erazi geriyan, lê ançax xezalekê spî bi tenê nêçîr kirin, li jora Avrika di nav sê rojê nêçîrde. Li gora hinekan xezala spî nîşana aştiyê ye û dîroka wê digihîhîje hezar salî lê nêçîrvan guh nadin van bîr û baweriyan û nêçîra xezalêni spî dîkin.

Nûçeyen Derve- Xezalêni spî bi taybetî li bakurê Vârmland nêzî tixübê Norweçê peyda dijin. Ew der cihekî turistîk e û belediya EDA jî, der barê xezalêni spî de bi broşuran didin xuyakirin ku, hejmara wan zehf kêm e.

ji ber vê yekê bi daxwaza Britt Marie Nordqvist civînek çedîkin ku, xezalêni spî bêne parastin ê, di civînê de bi piranî bîr yate standin ku xezal bêcîhêkirin dê bêne nêçîrkirin,

weke yên din. Mîxabin xezalêni spî yên çavşîn û nîşana aştiyê dê nêçîr bibin û bîn selîxandin bi kerikên kalanî.


Mirov biryara wan û parastina wan bi du awayî dikare binirxîne, wek parastina mirov û sewalan. Yek; Ewrûpi ne, medenî ne, pêşverû ne, ji her kesî bêhtir mafparêz in. Dido; dema li cihekî şer û ceng dertê, hema zû dest datînin ser, ci ye? Ew mafêni mirovan diparêzin, ji ber ku berjewendiya wan di wî warî de heye, lê mîxabin dema berjewendiya wan di cihekî de tune, jixwe nêzî wir jî nabin Nedîtine û ne jî bihistine. Mînak, dema Sedam Helebce bombe kir; 8000 insan kuştin, Ewrûpi tev bêhis û deng man wek ku, yek li civatekê tirrek bike û bi êje, eman gidi bila kes bi min nehise ku, min ev tirî kiriye. Ji ber ku fabrikeyen çek ên kimyewî Ewrûpiyan damezirandibûn û bi ser de jî, Kurdan wek hirç û hov diditin. Di 1989'an de li Swêdê, li Federasyona Kurdi, di civînekê

de Swêdiyan dîsa Kurd û tekosuna Kurdan hovane diditin. ji van gotinêni Swêdiyan yekî Kurd zehaf aciz bû, bû wek a-

gir û wiha bersiva wan da: "Ka, em bibin sewalîn we, wek piştîkî li ber piyê we, belki wê hengê, hûn pariyeji me hez bikin û me nas bikin. Madem hûn ji me wek mirov hez nakin, wek sewalîn hez bikin. Ma Em wek fokan nabin ku, dema torvanen Norweçîyan fok bi saxîti digirtin û digurandin ji bo çermê wan, piştî du rojan Dinya tev rabû ser piyan û balonêkî mezîn wek şeklê fok'ê firandin ferya (hawa) û torvanen Norweçîyan hatine protestokin. Ma bîr û baweriya we tenê bi sewalan heye? Ma hûn tenê sewalan nas dîkin? Ji kerba na-va xwe civînê terk kir û çû. Lê, serokên civînê şerm nedikirin û di ber xwe de hûr hûr dikenîyan.

ji rojnameya **Dagens Nyheter.**

Niûsar Hans Bergström. Werger: **S. S. Dilpolo**



Xezala nêçîrbûyi

Şerê li Kurdistanê sermaye kir du felq

Cem Boyner ê ku serê "Tevgera Demokrasiyê ya Nû" dikişîne parast ku, pirsgirêka Kurd dikare bi tenê bi gelê Kurd re bê çareserkirin. Yekîtiya Ode û Borseyên Tirkîyeyê (TOBB) jî di Civîna Heyeta Odeyên Saneyiyê de daxuyandin ku, hin devêren "Rojhilat" di bin dagirkeriyê de ne, meseleya Kurd bi sebebê aboriyê ve girê dan û nirxandinek li ser artêşa Tirk kîrin ku, têkoşîna rizgariyê dide.

Ercan KILIÇ

Têkoşîna rizgariya gelê Kurd ku bilind dibe, sermaye Tirk kire du felq. Cem Boyner ku serê "Tevgera Demokrasiyê ya Nû" dikişîne parast ku, li Tirkîyeyê bi tenê bi Kurdan re tê karîn ku daxwazên refah, aştî û azadiyê bêne temînkerin. Di meha çûyî de Cem Boyner tevî gruba xwe ku tê de Prof. Asaf Savaş Akat jî cih distîne metnekê bi navê "Tirkîyeyâ nû, dinyaya nû û demokrasiya nû" ji gengeşiyê



re vekirin. Di vê metnê de tê diyarkirin ku, di şêmûga salên ber bi 2 hezarî ve înkarkirina hebûna Kurdan xeyalkarî ye.

Ji aliye din ve sermayedarîn ku li İzmirê besdarî Civîna Heyeta Odeyên Saneyiyê bûn derbirandin ku, Tirkîye li "Rojhilat" bi artêşa xwe şerê rizgariyê dide. Ew sermayedarîn ku bi çavên berjewendiya xwe li meseleyê dinêrin, pirsgirêka Kurdî bi sebebê ekonomik ve girê dan û di vê mijarê de dewlet súcdar dîtin. Tesbiteke din a karsazên ku besdarî civînê bûn ev bû: "Ev bûyer serhildanê civaka ku me ew negihandine hilberkariyê ne".

Gruba Cem Boyner temînkerîna bêrî û daxwazên azadî, refah û aştiyê bi gelê Kurd ve girê da û daxuyand ku, bi besdariya wan mesele dikarin çareser bibin. Kesên ku besdarî civînan bûn, tu kesî ji aliye çareseriya demokratik ve nêzîkahî li pirsgirêka Kurdî neda.

Di metna ku gruba Boyner ji bo gengeşîkirinê amade kîrine de ev lênerîn hene:

-Meseleya Kurd bi tenê bi Kurdan re dikare were çareser

serkîrin

-Em bawer nakin ku daxwaz û bêrikirînê azadî, refah, aştî yê Kurdên Tirkîyeyê bi parçebûna Tirkîyeyê pêk were

-Riya çareseriye divê di dialogê de derbas bibe. Ji aliye kî ve hikümet û otorîteyên sivil û leşkerî, ji aliye din ve ji nûnerîn gelê Kurd divê riya dialogê vekin, minaqeşeyan ji dayina heq û ji nedayîna heq derxin û bikin ku, hemû kesen li Tirkîyeyê dijîn karibin bi awayekî serbest zimanê xwe, çanda xwe bijîn û

cihêrengiye xwe bînin ziman.

Ji besdarîn Civîna Heyeta Odeya Senayiyê, Serokê Yekîtiya Ode û Borseyen Tirkîyeyê (TOBB) Ömer Dînçkök ev lênerîn parastin. Dînçkök daxuyand ku, hin dever li "Rojhilat" di bin dagirkeriyê de ne û ew ji bandora xwe li pêkanîna projeyan dikin.

Serokê Odeya Senayiyê ya Stenbolê (ISO) Memduh Hacıoğlu ji meseleya Kurdî bi sebebîn aborî ve girê da û derbirand ku, "Serhildana gel ji ber ku dewlet ew nexistine rewseke hilbirînkar" e.

Hacıoğlu diyar kir ku, ciwanîn bêkar û betal dimînîn wek li Diyarbekirê derdikevin ciyê.

Serokê Konfederasyona Sendîkayê Kardêr (TİSK) Refik Baydur di civînê de gote ku, li "Rojhilat" şerek heye û divê di şuna leşkeran de tim timên taybetî hebin. Ev helwesta Baydur wek dilkwazek "Artêşa Taybetî" hate nirxandin.

Dorhêlin siyasi û aborî diyar kirin ku, bi livbaziyan PKK'ê yên li ser dezgehen aborî re, endîse û tîrsa sermayedarîn Tirkîyeyê zêde bûye û hin bêhtir sermayedar li gorî berê dixwazin bala xwe li ser pirsgirêkê gurr bikin.

Li nexweşxaneyan kar sekînî



Navenda Nuçeyan- Roja 27'ê Cotmehê xebatkarân tenduristîyê ji bo ku pirsgirêken wan ên aborî û demokratik bêne çareserkirin, ji bo rojekê kar rawestandin. Livbaziya doktor û xebatkarân tenduristîyê bi pêşengîya TTB (Yekîtiya Bişîşkîn (doktor) Tirk). Sendîkaya Tûm-Sağlık-Sen (Sendîkaya hemû xebatkarân tenduristîyê) û Sendîkaya Genel Sağlık-İş ê çêbû. Li gelek bajaran xebata li nexweşxaneyan rawestiya, ji bili nexweşen acîl û giran, nexweşen din nehatin muaynekirin.

Li Stenbolê jî xebatkarân

gelek nexweşxaneyan kar berdan. Kesên ku livbaziyan pêk anîn, li ser nirxandina livbaziyê û xebatênu dê di pêşerojê de pêk werînîn civîn li dar xistin. Li Enquerê 35 hezar xebatkarân tenduristîyê kar berdan. Di livbaziyan de, pankartên wek: "Em bergîdana keda xwe dixwazin", "Em dixwazin wek mirovan bijîn" hatin bilindkirin. Sloganên ku dihatin avetin ji bi vî rengi bûn: "Gotin, raye, biryar ji kedîkarîn re". Li İzmirê jî xebatkarân 13 nexweşxaneyan dev ji kar berdan û livbaziyan xwe bi govend û stranand mandandin.

Dewletê berê xwe da girtiyan

Navenda Nuçeyan- Dewlet pest û pêkutiyêni li ser girtiyan siyasi dijwartir dike. Li Girtîgeha Bucayê 3 kesen itîrafkar roja 21'ê Cotmehê ji aliye girtiyan ve hatin kuştin. Roja 22'ê Cotmehê ji leşkeran ériş birin ser girtiyan PKK'van. Di érişâ leşkeran de 63 kes ji girtiyan bi xedarı birîndar bûn. Kesên birîndar li nexweşxaneyê ji, ji aliye polisan ve lêdar-xwarin: "Bi vê yekê re girtiyan Girtîgeha Bucayê dest bi greva birçîbûnê kirin. Greva bi awayekî dorvegerî didome.

Sekreterê Komeleya Mafêni Mirovan a Şaxê İzmirê Ebûqat Kemal Bîlgîç daxuyand ku, ewlekariya jiyana girtiyan tune ye. Li aliye din, ew

kesen ku kuştina girtiyan girtin ser xwe hatin sirgûn kirin. Ji wan Mehmet Yıldırım û Mehmet Darga şandin Girtîgeha Çanakkaleye. Şehmus Yüksel sirgûnî Girtîgeha Bursayê kirin, nûnerî girtiyan Cömert Bozkurt jî sirgûnî Girtîgeha Aydinê bû.

Girtiyan ji rêxistinê Tirk ji di Girtîgehan de işkencyêni dijwar dibînîn. Roja 23'ê Cotmehê ji Devrimci Sol 17 kes anîn Girtîgeha Bucayê û ji nav wan Aslıhan Gençay û Aydin Kaya ji qerdîyanan lêdaneke dijwar xwarin û bi xedarı birîndar bûn.

Li aliye din girtiyan Girtîgeha Amedê bi daxuyaniyekî diyar kirin ku, ewlekariya canê wan nemaye û ji he-

mû bûyerên ku pêk werin dewlet berpirsiyar e. Girtî diyar kirin ku, roja 22'ê Cotmehê çend ji girtiyan ku cûne dadgehî ji leşkeran gef û çérêne nebaş bihistine. Serbazî leşkeran ji, bi awayekî eşkere destûr daye leşkeran ku, ji bo bûyereke biçük ji, çekteqandin serbest e.

Li Girtîgeha Mazrayê (Elezîz) ji, girtî di nav zilm û zorê de ne, girtiyan ve girtîgehî ji bi daxuyaniyekî problemen xwe diyar kirin. Li gorî beyana girtiyan, zilma li ser wan zêde bûye û mafê wan ên ku, bi greva birçîbûnê ya di meha Hezîranê de bi dest xistibûn, ji wan hatine standin û girtî bi biryar in ku, wê bêdeng nemînin.

Penaberê İranî di greva birçîbûnê de

Navenda Nuçeyan- Penaberê siyasi yên İranî, li Enqereyê li ber nûnerîya Neteweyen Yekbûyî (NY) roja 25'ê Cotmehê dest bi greva birçîbûnê kirin.


Penaberê İranî, armâna grevî bi livbaziyan terorist ên dewleta İranê û pest û pêkutiyêni polisîn Tirk ve girê dan û daxuyandîn ku, ji ber van yekan di tengasiyeke mezîn de ne. Li gorî beyana berdevkêni livbaziyan, heta iro gelek hevalen wan ji aliye rejîma İranê ve li nav sînorîn Tirkîyeyê hatine kuştin û polisîn Tirk jî ew bi teslimkirina İranê ve tehdît. Li ser van bûyeran ji gelek caran

serî li Komîsargeha Bilind a Penaberan ku girêdahiyê NY'ê ye dane, lê tu encam bidest nexistine. Penaberê İranî dadixuyînîn ku, heta ev pirsgirêken wan çareser nebin û mafê çûyîna dewleteke Ewrûpî bi dest nexin, dê greva birçîbûnê bidominin.

Penaberê İranî ku ji Fars, Ereb û Azerîyan pêk tê, ji 15'ê Cotmehê bi vir ve livbaziyan rûniştinê dikirin. Niha ji 16 kes ji wan dest bi greva birçîbûnê kirin. Penaberê İranî ji bo çareserkirina pirsgirêken xwe banîa piştgiriyê li hemû saziyên demokratik û mirovperwer kirin.

Gelên Asûrî û Suryanî bi hesreta wegera welatê xwe ne:

Di warêne xwe de mihacir



Noomi Linjefors produtora TVé.



Meryem jineke 120 sali ye û bi tenê ye. Pişti malbatâ wê û pismamên wê gundê xwe terk kirin ew bi tenê ma û li dêran pavaniyê (notivaniyê) dike.

Çawa baweriya mirov hew çend zexim dibe ku, mirov canê xwe ji bo wê dikare bike gorî (qurban), ji bo baweriya xwe tim mihacir û fermalû (koçber) bibe. Der barê van gelên kevin û baweriya zexim de filmek hate çekirin û di TV'ya Swêdî di kanala 1. de ji teref produkto Noomi Linjefors ve hate weşandin.

Noomi Linjefors dixwest ku çand û zimanê wan baş nas bike, ka ew gelên han kî ne, ji ku derê ne. Noomî Linjefors salek bi wan re têkilî danî. Kêm be ji lêkolîna xwe hinek bi pêş ve bir. Wî ew hîn ji nêzîktir ve nas kirin û dît ku ev gelên han Asûr û Suryan in û ji beriya du hezar salan tê. Ji du hezar salan û bi vir ve, di bin zilm û zordestiyê de ne, bi serbestî çand û zimanê xwe bi kar.

neanîne. Ji ber ku misilmanan her tiştîn wan qedexe kirine. Tenê bi serbestî dikaribûn karê zireatê bikin. Noomî Linjefors ev salen ku bi wan re têkilî danîne, tim ji firoşgehêwan danûstandin kiriye û daxwaza Noomî ew e ku, bi her kesî bide naskirin ku, ev gelên han Asûr û Suryan in û warê wan ji Mezopotamya ye û zilma 2000 salan li ser wan heye. Ji ber vî awayî, navê film danîne "Pişti 2000 salan li ba me û li dinyayê", zimanê wan ji, ji zimanê Hz İsa ye.

Film hem li Söderlajeyê (bajarê Swêd) hem ji li herêma Midyatê derbas dibe. Midyat bajarekî li Mezopotamya tê zanîn li Söderlajeyê.

Fuad der barê bihuştê de wiha beyan dike: "Ji ber ku ola min Kristianî (felehi) bû, ez hatim girtin û di gitteğen KT'ê de hatim îşkence kirin, çawa ku hûn ji bi çavên xwe dibinîn, ji ber vê yekê ez û kesen wek min direvin û tene vir. Ev der bihuşt e.

NASNAMEYA BAWERIYÊ

Raad, mîrekî biçük, hê12 sali ye. Dîroka xwe ji baş dizane. Raad,

dibêje ku ew û gelê wî pirr bûn lê, wê gavê hema bi bêje ku ew nemane.

Gotineke Misilmanan heye dibêje: "Mirov diçe bihuştê ku mirov destê xwe di xwîna yekê xrîstian (felehi) de biço." Pişti rojê Muhemedî (îslamiyeti) em tim hatin kuştin û li ser serê me ferman rabû ji ber ku em tim hatine kuştin, em wiha hindik in. Niha li gundê me 2500 kes tenê mane, yên din li her deverên dinyayê belavbûyî ne, yên li heremê mane ji tev pîr û kal in."

Mirov dikare bibêje: "Ma gelo, ev kesen ku li warê xwe mane cîma nabêjin ku Misilmanen Tirk in û di nav wan de xwe nadîn cûdakirin. Wê hengê ew ê azad û serbest bûbûna. Lî, dema min ew nas kirin, min fêm kir ci bawerîyeke wan a ze-xim heye û ji ola bav û kalên xwe dernayen."

JİYANA ASÛRÎ Ü SURYANIYAN

Asûrî û Suryanî li Söderlajeyê hatine bicihkirin û der barê me de zehf kêm tiştan dizanin. Hê ji nahşî (xişim) nin li ba me li Swêd. Ew hatin vir ji bo ku ev der welatekî xrîstianî ye, lê mixabin me bi xwe xwe ji bîr kiribû ku em xrîstian in û ji wan re xrîstiyaniya me zehf ecêb tê ji ber ku em miriyen xwe dişewtînin. Çawa ku, ji me re şeverêkek di nav gorisanî derbas re bibe.

Ev nîvîs ji **Rojnameya**
Dagens hatîye wergerandin
Nyhter: **Christian Kelberg**.
Werger: **S.S.Dilpolo**.

NÊRÎNEK

Nizamettîn Toğuc

Rim û kewar

D u meh berê min ji serokatiya parlementoyê pirsî: 'Dema navlêkîna şerê li Kurdistanê nehatîye? Ev tişt ne şer bi xwe ye? Ger ku hûn dipejîrinin ev şer e, kifşkirina rîz û qaydeyîn wê, ji bo gelê Kurd û Tirk ne bi xertir e?'

Deh roj bi ser ve ne bihûrî, camêran (!) li Batmanê bi devê tivingê bersiva min dan. Jixwe "neyartî bêminetî ye", ku bextê neyarê mirov ji hebe pariyek li qeyde ye. Ez ci bikim; Roma bêbext para me ketiye.

Hinek nijadperesten dengqîjik, rojnamevanen "Mehmetçik" û rayedarên kîmaqîl ji me parlementerên DEP'ê re dibêjin: "Hûn endamên PKK'ê ne." Xweli li serîno! PKK li ku, em li ku. Ji we tirê ku endamiya PKK'ê wisa hêsan e?

zorê, koçberî û qirkirinê naxwazin. Bi van daxwazan ku em bibin endamên PKK'ê, nexwe endamên PKK'ê ne em bi tenê ne. Çiqas mirovek li ser rûyê gerdûnê yê misilman hebe, endamê PKK'ê ye. Ji ber ku gelek xwestekên PKK'ê û İslamiyetê dişibin hev û din. Weke qedexekirina araqê, listîna qumarê û fuhûşê...

Dîsa xwestekên PKK'ê û yê komûn demokratîk û mafen mirovan ji, ji

Hinek nijadperesten dengqîjik, rojnamevanen "Mehmetçik" û rayedarên kîmaqîl ji me parlementerên DEP'ê re dibêjin: "Hûn endamên PKK'ê ne." Xweli li serîno! PKK li ku, em li ku. Ji we tirê ku endamiya PKK'ê wisa hêsan e?

sedî not dişibin hev û din. Bi vî rengî ew ji dîbin endamên PKK'ê. Bi vî awayî mirov dikare mînakana zêde bike.

Haylo!... Malik li hinekan xera bûye haya wan jê tune ye!

"Rim di kewarê de nayê veşartin". Ev şel destpêka dumahîkê ye. Tirêjîn tava azadiye avetiye. Hindik maye şevşevok ji welatê me birevin. "Ev lîlê ye, lolo li paşiyê ye". Dêhna xwe bidinê, ev kar dê di ku de derkeve. Xwedê ji tewanbaran re nahêle. Tiştê anîne serê Kurdan, dê yeko yeko di pozê wan de were.

Mehrîcana Kurdistanê

Welat/BONN: Mîhrîcana govend û müzîkê ya Kurdistanê-93, a heftemin ku ji a-liyê Hunerkom'ê (Yekîtiya Hunermendên Welatparêzê Kurdistanê) ve tê amadekirin wê di navbera rojê 30-31'ê meha Cotmehê de cê bibe. Mîhrîcana li bajarê Braundschweig ê, yê Almanyayê li dar dikeve.

Mîhrîcana ku wê tê de ji govend û müzîka Kurdi ya gelêrî û hemdem bêne pêşkêşkirin, gelek komên müzik û govendê wê ji welatên Ewrûpayê yê ji hev cihê besdar bibin. Di mîhrîcana de komên ku bi ser bikevin wê ji aliye amadekarên wê ve werine perû û xelatkirin.

Komên müzikê yê ku ji müzik gelêrî û hemdemî mînakîyan pêşkêşî mîhrîcana bîkin ev in: Koma Amed-Hannover, Koma Botan-Berlin, Koma Bêri-van-Bonn, Koma Cesûr-Bielefeld, Koma Ferad-Köln, Koma Serkeftin-Frankfurt, Koma Serhildan-Nörnberg, Koma Welat-Hamburg, Koma Jiyan-Stuttgard, Koma Nûjîn-Danîmarka, Koma Sef-qan-Swîsre, Koma Soreş-Avusturya û Koma Zîlan-Hollanda.

van-Bonn, Koma Nûjîn-Wuppertal, Koma Ferat-Köln û Koma Serhed-Fransa.

Komên ku wê ji herêmên Kurdistanê govendên cur becur pêşkêş bîkin ji ev in: Koma Amed-Hannover, Koma Egit-Mannheim, Koma Botan-Berlin, Koma Bêri-van-Bonn, Koma Cesûr-Bielefeld, Koma Ferad-Köln, Koma Serkeftin-Frankfurt, Koma Serhildan-Nörnberg, Koma Welat-Hamburg, Koma Jiyan-Stuttgard, Koma Nûjîn-Danîmarka, Koma Sef-qan-Swîsre, Koma Soreş-Avusturya û Koma Zîlan-Hollanda.

Gelek kesen zanyarê çandê, komên müzik û go-vendê tevî hunermendê Hunerkomê, bi skeç û nirxan-dinê xwe ve dê besdarî mîhrîcana bîbin. Ji aliye din ve ji rayedarên mîhrîcana daxuyandin ku, dê ev mîhrîcana li gorî yê derbasbûyî hin bêhtir dewlemend pêk were û her wiha wê ji metbexa Kurdi ji mînakîyen dewlemend bêne pêşkêşkirin.


Nek



Dema min dikarı, nedizanî;
dema min dizanî, nedikarı

Mahmut Paşayê Caf

Lûy û citiyer



Yew zemoni di yew lûy û citiyeriya benê way û biray. Lûy citiyerî ra zaf hol kena. Tim û tim xeberûn ûna. Indemi di yew xeş musayo queriyek. Xeş tim û tim yenû queriyeki telef kenû. Citiyer kutikon benû yegay ver, merdimûn çekdarûn benû, la taway pere nêkeno. Wi mecmûr mûnenû hena sîno lûy het. Citiyer lhuy ra vano: "Wayê yew xeş müsawû queriyek ma, yegay mi di yew taway nêwerda, ma ey ra senî bixêlisim."

Lûy vana: "Bira, ez sibay yew gezî kena, biyecê xwi ya dumara yegay şina

yena." Toz dûmûn verdano itayay ser. Ti pers bikir vaci ki. "Çi sebiyo." Ez vano ki, "la mîr welat niweş koto, hekîm ame ser." Hikîmî vat ki, "Dermon niwêşî çino." Merdimî xeşû gerek kom cayo xeş ame vînayîş biyerê kişîş û dimê yi biyerê tirakerdîs.

Rojêy bîn serê sibay lûy yena o kide kena. Der cîrûn yenî piyeser personi, vuni: "Çi taw sebû?"

Lûy vana: "Hay lo, meperiyen. Mir welat niweş koto, darî dêriyi dimê xeşo. Gerek kum ca yew xeş esto, biyero kişîş."

Xeş veng lûy eşnêyno. Lûy

cuwabê het şina. Xeş vano: "Wayê o çu ti vana?" Lûy vana: "Birawo, mepers. Al xewal ûnay."

Xeş vano: "Wayê ez sebikirî."

Lûy vana: "Biya îna çal kurî, ez kerû duna tu ser, tu nimnena."

Xeş vano: "Wabû, wî kuweno zerrê çâ. Lûy kerun duna yî ser, wî bin di kerûni di munenû."

Xeş bin ra qêreno: "Wayê caykê mi ayseno?"

Lûy vana: "Guşê tu ayseno."

Xeş vano: "Guşunê mi tîrakirî."

Seyithan Kurij

Jûjî...

Doğan Güzel

T.C. YA KU LI LİCË KETLİAM GËKIR, NEHİST KU NAVÇE ÇAR
ROJ LI SER HEV TEKİLÎ BI DINYAYÊ RE DEYNE... HETA NEHİST
KU PARLEMENTERE WANJÎ
BIKEVE LİCË...

QEDEXE
GIYE!
EZ PARLEMENTER
IM PARLEMENTER



KÊ CI PEKAND?

Li Tirkîyeyê di destpêkê de pirsgirêka
Kurd tune bû, ya rojhilat hebû.

Osman Bursali
Nivîskarê rojnameya Cumhuriyet'ê



Çelek bi dizî avis dibe lê eşkere dizê

Di çend rojên borî de rojnameyên biyanî nivîsandin ku, Ci-girê Serokwezîrê Hikûmeta Federal a Kurd Roj Nûrî Şawês, di gel hin berpirsiyarê rejîma Iraqê, li Ewrûpayê çend ci-vînên nehînî pêk anîne. Lê Dr. Roj di pey de bi navberiya rojnamevanan ev tişt derewand.

Rojnameyên derive careke din jî nivîsandin ku, zilamek bi navê Macît Abdulreza ku berî niha endamê Komîteya Navendi ya Partiya Komünîst a Iraqê bûye, niha jî wek alîgirê Sedam û cehşîkekî Kurd dixuye, navberiyê di nav serokên Kurdên Başûr û Sedam de dike. Rojname dadixuyînin ku di bernameya Abdulreza de ne xweserî (otonomî), ne mafê çareya xwe nivîsin û ne jî federalî hene.

Sedam Husên ji piştî sala 1979'an ji sedî bêhtir ji bo Kurdan "lêborîn" derxistîye. Lê Sedam navê Kak Mesûd û Mam Celal tu carî nedixist nava "lêborîna giştî". Ez wisa difikirim ku, Sedam bi navberiya Macîd Abdulreza dixwaze di lêborîna xwe ya nû de hin guherînan bike û vê carê navê herdu zilamîn me yê birêz bixe navê.

Dîroka Bizava Kurd li başûrê Kurdistanê tiştekî seyr û sôret e. Ev e ji 30 salan bêhtir e ku, rejîma Bexdayê tevgera Kurdi bi "veqetînxwaziye" dinavîne. Lê serokatiyên Başûr ji peyvîn "otonomî" û "demokrasi" yê pê ve tu peyv bi lêv nedikirin ta ku di sala 1992'an de Amerîka ji wan re got: "Ji niha pê ve federalîyê bibêjin". Lê tu navekî projeya Abdulreza nîn e.

Serpêhatiyeke Kurdi ya kevin hate bîra min ku, nivîskarê me yê şehîd Hesenê Qızılçî di pirtûka xwe ya bi navê "Kenîna Parşek" de nivîsiye. Dibêjin ku, xulam û axayekî Kurd di şeveke zivistanê de, bi hev re li derive dimînîn. Sev şeveke sar e. Axa ji sermayê nikare binive û ji xulamê xwe re dibêje: "Ji min re tiştekî bîne ku ez biavêjîm ser xwe". Xulam gelekkigere, lê tiştek nabîne. Difetile nik axa, dibêje: "Ezbenî, bi tenê palanê hespê te heye." Axa dixeyîde û dibêje: "Hiş be kero."

Qederek di navê de dibore, serma her diçe bêhtir dibe û ri-helîna axê ya ji ber sîrrê pîrtir dibe. Careke din gazî xulamê xwe dike: "Lawo tiştekî ji min re bibîne ku ez bi xwe wer bikim. Heke nebe ez dê ji ber sermayê bîmirim." dibêje. Xulam bersiva axayê xwe yî delal dide: "Axa! Ez bi serê te û bi serê rehmetiyê bavê te sond dixim ku ji palanê hespê te pê ve tiştekî din nîn e." Vê carê axê me bi dengekî nermî ze-nûn: "Kuro, hey seyê kurê seyan. Bîne lê navê wê nebêje." Dibêje.

De niha ji serokatiyên Başûr ewqas bêbawer bûne ku, bi her tiştî razî ne, bes navê ewan tiştan nayêngotin.

Ê min ku ez jê dixeyidim ew e ku, cîma van deng û behsan ji gelê Başûr vedîserin. Cîma ev gel ne ew gel e ku gorîyan daye. 182 hezarîn Enfalbûyî 8 hezar Barzaniyên windabûyî di sala 1982'yan de. Şehîdîn Helebçe û gelekoçê bîhara 1991'i. Ev gorîyen gel in, ne yên serokatiyan in. Cîma mafê gel nîn e ku bi rewşa xwe bihese û peyvek li ser çarenûs û pêşeroja xwe bibêje.

Heke niha peyvînên wan ên nehînî bi dijmin re diyar nekin dê rojek were her tişt derkeve holê. Pêşiyêne me çiqas rast gotine, "Çelek bi dizî avis dibe, lê eşkere dizê."

NÜÇEYA TAYBETİ...NÜÇEYA TAYBETİ...NÜÇEYA TAYBETİ...NÜÇEYA TAYBETİ...NÜÇEYA TAYBETİ...NÜÇEYA TAYBETİ...

Dewlet bi Şirnexê re bazarê dike

Welat/Şirnax – Li Şirnexê rayedarên dewleta Tirk dixwazin bi gerîlayen ARGK'ê re li ser pirsgirekekê li hev bikin. Bi awayekî endirekt Walî, Midurê Emniyetê û Qumandarê Tugaya Şirnexê digerin ku pêwendiyän bi gerîlayan re girê bidin û bi hin şertan mi-hendisekî bi berî mehekê ji a-liyê hêzên PKK'ê ve hatibû revandin, bidin berdan.

Weke tê zanîn di meha İlönê de gerîlayen ARGK'ê ji Şirnexê mihendisekî bi navê Mustafa Mungal ku di Saziya Elektrikê ya Tirkîyeyê (TEK) de dixebebi û karkerekî bi navê Cemil Mağrûr revandibûn.

Bi mebesta serbest berdayî-na Mihendisê TEK'ê Mustafa Mungal, Waliyê Şirnexê Cahit Kiraç, Midûrê Emniyatâ Şir-

Dewlet bi devê fermî (resmî) PKK'ê wek muhatap qebûl na, lê zehf caran ji mecbûri li hember PKK'ê tawîzân berbiçav dide û bi dizî be ji hewl dide ku pê re bikeve têkiliyên lihevhatinê. Bi taybeti li deverênu ku şer lê gurr û geş e, gelek caran rayedarên dewletê yê herêmî, leşker an ji sivil bi PKK'ê re ne rasterast be ji, dikevin bazarê. Herêma Botan yek ji wan deveran e ku bazarên dewletê bi gerîlayan re çedibin. Walî, Midurê Emniyetê û Qumandarê Şirnexê van rojan di hewldaneke mezin de ne ji bo ku, bi gerîlayan re bikevin têkiliyê û li ser hin şertan bazarê bikin.

nexê Eriş Kizildar û Quman-darê Tugaya Şirnexê bi gire-girê Şirnexî re ketin hin bazaran. Ev rayedarên dewletê yê herêmî ji Şirnexiyan dixwazin ku, di navbera wan û gerîlayan de bibin navgîn, da ku ev muhendisê TEK'ê bê berdan.

Walî, Midurê Emniyetê û

Qumandarê Tugayê pêşî bi tehdît cûn bi ser Şirnexiyan ve ji bo ku vê daxwaza xwe bi wan bidin qebûlkirin, lê dema daxwaza wan nehate cih bi a-wayekî nerm bi ser hin kesen navdarên Şirnexî ve cûn û soz û peymân dan wan û gotin: "Ger mi-hendisê TEK'ê hûn bidin berdan, wê vekirina kanen komirê ji Şirnexiyan re bê serbestkirin li hember vê qenciyâ we". Weke tê zanîn ev cend meh in dewlet rê na-de Şirnexiyan ku kanen xwe yê komirê bisixulîn. Li Şirnexê zêdehî sed kanen komirê hene û idareya gel bi giştî li ser danûstandin û karû-baran komirê ye.

Hewldanen Walî, Midurê Emniyetê û Qumandarê Tugayê bi tewra nerm jî negîhiş-tin tu encamî. Dawî bi awayekî tehdîtvarî dîsa bi ser Şirnexiyan ve diçin ji bo ku, bibin navberen wan û ARGK'ê.

Ji ber vê tewra wan Şirnexiyan ji reaksiyon nîşan dan. Li gor agahiyên ku me ji devê çend Şirnexiyan standine, li hember tehdîten dewletê Şirnexî ji dewletê tehdît dikin.

Yek ji van kesen Şirnexî ev rewş wiha anî zimên: "Walî, Midurê Emniyetê û Qumandarê Tugayê zedî bi ser me vê tê û dibêjin: "Hûn ci dikin bikin, herin bi berpirsiyare ge-riyayen Şirnexê re biştexilin û Mustafa Mungal bidin berdan. Ger hûn vê bikin eme rê bidin we ku hûn kanen komirê ve-kin û bisixulîn, lê ku hûn vê daxwaza me neynin cih em dizanin eme ci bi we bikin." Li ser van tehdîdên wan ên ku her roj dikin, me ji idare nekir û ji wan re got: "Ku hûn bi vî şeklî bi ser me ve werin eme di demeke pirr nêzîk de hemû zarokên xwe bişînîn ser ciyan û ictab bike eme ji herin, ji ber ku we hizûr ji me re ne-

Quşt, bes e êdi hûn ci dixwazin. Ger hûn berdانا muhen-dis dixwazin, wa ye li cem gerîla ye, herin wî ji wan bistî-nin.

Her çiqas eşkere PKK'ê wek aliyeke ser na-pejirîne ji, kirin û tewrîn dewletê bere-vajiyê vê idayê radixin ber çavan. İro, dewleta Tirk ji ber si-yaseta xwe ya kevnare û ni-jadperest nexwaze rasterast PKK'ê muhatap bi-pejirîne ji, hemû kar û barêna xwe û plan û programen xwe li gor mer-haleya têkoşîna gelé Kurd di-meşîne û di prafîka xwe de wî wek aliyeke ser dibîne û dikare bê gotin ku, gelek caran û li gelek deveran li hember PKK'ê tawîze dide ji bo ku ka-re-pê re bikeve têkiliyê.

Li Kurdistanê, li deverenê ku hêza gerîla bi ser ya dewletê ketiye, ji mecbûri, rayedarên dewletê yê herêmî, sivil an ji leşker di gelek mijaran de tek-lîfîn lihevhatinê pêşkêşî PKK'ê dikin. Li gor jêdarên herêmî li gelek bargehê leşkerî, qumandarên leşkerên Tirk ji bêmeçalî, ji gerîlayan re dibêjin: "Hûn li me nexin, hûn ci dikin bikin." Wekî din dema pirsgirêke derdi keve holê, rayedarên dewletê yê herêmî bi dizî dixwazin bi gerîlayan re bikevin têkiliyê û bi bazarê van pirsgirêkan çare-ser bikinin.

ROJEVA WELÊT

Rastiyê şer cihêreng in

Dewlet çiqas dikeve tengasiyên mezin ji, dixwaze her tim dîtinê xwe yê kevnare û ji rastiya iro dûr, biparêze û bimeşîne. Têkoşîna gelê Kurd û pêşveçûna şerê çekdarî, her roj hînekî din dewleta Tirk ber bi rûniştina ser maseyê ve dikişîne, lê, ew rayedarên iro ku mejiyê wan bi ideolojiya kemalîzmê ev 70 sal in têne şûştin, hê ji naxwazin vê rastiyê bibînin û li pêşîya çareserkirina pirsgirêke Kurdi dibin bend û mîjûya aştiyê bi derengiyê dixînin.

Pêşveçûnen van rojan dawî, xurtbûna êrîşen gerîla, bilindbûna têkoşîna azadîxwaz a gelê Kurd, rastiyê bi carekê raxist ber çavên dînozorênu ku li serê kana dewletê rûniştine. Ên ku heta doh digotin: "Ew terorist hejmareke biçûk in, lê em dewleteke mezin in", iro ser-hildana gelê Kurd qebûl dikin, lê vê carê ji dibêjin: "Emê wan tune bikin". Û ji bo tunekirinê ji bîryarênu xwe dikin yek, bi ser navce û bajaren Kurdistanê ve diçin û qetliaman pêk tînin. Qetliama Licê di rastiyê de teslimiyeta dewleta Tirk e. Lewre bi vê qetliamê re tîrsa xwe eşkere kirin, qelsiya xwe ûlan kirin, bêsiyasetbûna xwe nişanî cîhanê dan.

Dînozorênu ku dibêjin: "Emê vê pirsgirêkê bi xwînê çareser bikin û PKK muhatabê me nîn e, em pê re rûnanîn", ji rastiya şer bêhay û agah in. Şer rastiya xwe diafirine û di nava şer de cihê gotinê vala û bêbingeh nîn e. Hêzên dewletê yênu ku di şer de ne û her roj bi mirinê re rûbirû ne, gelek caran aciziyê xwe li hember gotinê bi vî rengi nişan didin û carina ji kenê xwe bi xwedîy gotinê dikin.

Tê zanîn ku, qumandarên qereqol û yekaneyên leşkerî, dixwazin bi gerîla re li hev bikin, da ku gerîla êrîş nekin û ew ji dengê xwe ji wan re dernexin. Lê ev bûyera dawî ya ku di manşeta Welat de cihê xwe girt, hemû rastiyâner derdike ber çavan. Li Şirnexê Qumandarê Tabûra Leşkerî, Walî û rayedarên dewletê ji bo berdانا mihendisekî ku, ji alyî PKK'ê ve hatibû revandin, ji xelkê daxwaz dikin ku naberitiyê di nav wan û PKK'ê de bikin û ji bo vê ji bertîl teklîfî gel dikin, dibêjin: "Emê kanen we yê komirê ji nû ve vekin".

Diyar e ku, dewlet ji zû ve ye ku PKK'ê muhatab digire û pê re bazarê dike. Lê vê yekê ji raya giştî vedişêre. Niha ji, ji nû ve riya xwînê daye ber xwe û dibêje: "Emê vê carê tune bikin". Ev deh sal in ku şer didome û her diçê ji gestir dibe. We ji, ji bo tunekirina wê hemû rû ceribandin. Baş e, gelo we rîyeke cihê yî çawa keşif kir û hûn dê "tune bikin".

Em dibêjin ku, fermo qada şer, rastî li wir eşkeretir têne dîtin û zûtir xwe bi mirov didin qebûlkirin, mafê we tune ye ku hûn li ser xwîna hînekîn din politika bikin û jiyanâ xwe bidominin.

Peymana Hikûmeta Başûr û Bizava İslâmî

Piştî 100 kuştiyan li hev hatin

Welat/Zaxo – Roja 23'ye Cotmehê li navçeya Çemçemali di navbera hêzên Hikûmeta Kurdistana Başûr û yê Bizava İslâmî de şer derket. Li gor jêderen herêmî, rejhîma Ira-raqê ji kete nav şer.

Tê gotin ku destpêka şer bi vî awayî dest pê kir. Roja 23'ye cotmehê cend kesen gumankêş di erebeyekê (oldest mobil) de bûn. Londrovereke Bizeva İslâmî ji pê re bû.

Zilamê asayışa herêmî li pey bûn ku, wan kesen di si-wareya oldest mobil de bûn, bigirin. Lê zilamê Bizeva

İslâmî qebûl nekir girtina wan û gotin ku ew kes hevalen wan in. Bi vî awayî siwareya oldest mobil derbasî Ira-raqê bû. Dû re di navbera wan de nex-weşî dest pê kir. Saet li dora 6'an zilamê Bizeva İslâmî baregahen pêşmergehan dan ber topan, pêşmergehek mir, 14 pêşmerge ji birîndar bûn. Piştî vê êrisa Bizeva İslâmî şer dijwar bû. Di encamê de nêzîkî 15 pêşmerge û 50 zilamê Bizeva İslâmî mirin.

Roja 25'ê Cotmehê bi peymaneke serrawestinê dawî li vî şerî hat. Peyman ji alyî Hikûmeta Başûr bi destê Se-

rowezir Xusret Resul Eli, ji alyî Bizava İslâmî ve ji bi destê Mele Eli Evdilezîz hate Îmze-kirin. Mele Eli Evdilezîz cih-girê Liderê Bizava İslâmî Şêx Osman e. Peyman li ser van 5 xalan hate qebûlkirin;

1)Divê şer yekser (yekcar) raweste. 2) Gunehkâr teslimî qanun bûn. 3) Lijneyeke hevpar (muşterek) ji bo lêko-lînê ji herdu alîyan pêk bê. 4) Ji Bizeva İslâmî yek bibe we-zîr di nav Hikûmeta Başûr de. 5) Biryar hate standin ku Mele Eli û Waliyê Kerkükê ser-dana navçeya ku şer tê de qewimîbû, bikin.

Kurdên soyeta berê û Nûnerîtiya ERNK'ê:

"Çapemenî bêeleqe ye"

Navenda Nûçeyan – Li Moskovê Yekîtiya Kurden CDS'ê û Nûnerîtiya ERNK'ê ya CDS'ê di 27'ê Cotmehê de bi civîneke ji bo çapemeniyê, bêhesasbûna çapemeniya dînyayê ya der barê doza Kurdi de derbirandin û eleqe ji wan xwestin.

Besdarbûna gelek saziyên çapemeniyê balekêş bû. Di daxuyaniyên bi Kurdi û Rûsi de, bi giştî li ser rewşa bakurê Kurdistanê, qetliam û koçberiyen ku li wê ji alyî dewleta Tirk ve pêk hatine û li kirina dewletê ya li Liceyê hate rawestîn, politikayen wê hatin nirxandin.

Serokê Yekîtiya Kurden Sovyeta Berê Yura

Nabiyev li ser pirsa nûçevanê rojnameya Tirk Hurriyet'ê wiha peyi: "Em ne rôexistineke girêdahiyê PKK'ê ne. Lê em ji hemû rôexistinê ku ji bo rizgarî û serxwebûna Kurdan têkoşîn hez dikin her wiha ji PKK'ê ji hez dikin."

Nûnerîtiya ERNK'ê ya Civata Dewleten Serbixwe (CDS) di dawîya daxuyaniyâ xwe de ev tişti diyar kirin: "Em tu maneyekê nadîn bêdengiye sazî û çapemeniya dînyayê ya li hemberî qetliam, talan, koçberiya ku, ji alyî dewleta Tirk ve li ser gelê Kurd têne mesandin. Ew bêdengiye li dijî çespînên politik ên dewleta Tirk heta ci hengê wê bidome?"

Dawi li qetliamên artêsa Tirk nayê

Dewletê dîsa rûyê xwe nîşan da

Navenda Nûçeyan - Artêsa Tirk, ji bo niha biserketî dixuye. Hemû rayeyên dewletê ku diviyabû di destê meclisê de bûna, bi temamî ji aliye generalan ve têbikaranîn û ev yek ji dijberiyen di nav leşker û sivîlan de dijwartin dike. Ber bi nêzikbûna dengdana ji bo dirêjkirina Rêveberiya Taybetî ku partiyen din biryar dabûn dê careke din dengê erêniyê nedin, artêse şantaja Gerîna Awarte (Siküyönetim) derxiste pêş ku bikaribe Rêveberiya Taybetî bidomîne. Bi vê ji nema, provakasyonê mezin li dar xist. Li Licê generalek xwe kuştin û avêtin sitûyê PKK'ê, dû re ji Licê bi çekên kîmyewî, tanq û topan bi temamî hilwesandin. Bi dehan kuştî û bi sedan birîndar encama provakasyona domandina desthelata artêse bû.

"EY XWEDÊ TU LI KU YÎ?"

Ev qêrîna dayikeke Kurd e, ku ji nav agirê xaniyên sewitandî yên Licê bang dike. Artêsa Tirk, ji bo pêkanîna plan û provakasyonê xwe, pêşî generalek xwe bi navê Bahtiyar Aydin ku serokê cendirmeyen herêma Amedê bû, da kuştin. Dû re ji li Licê qetliameke girseyî pêk anî. Di vê qetliamê de çekên kîmyewî ji di nav de, çekên giran hatin bikaranîn. 22'yê Cotmeha 1993 yan dî dîroka Kurdistânê de bû mêtûya qetliameke din. Bi sedan xêniyên sewitandî, bi sedan birîndar û bi dehan kuştî ev roj wek rojeke

reş di nav rûpelên dîroka Kurdistânê de bi cih kirin.

Dewlet pişti qetliamê hemû riyan Licê girt û nehişt tu kes bikeve navenda Licê û qetliamê bibine. Serokê CHP'ê Deniz Baykal ji, tevî ku ji hikümetî destûr standibû, nikaribû bikeve nava Licê û ji nêzî Licê ji alîyê timan ve bi paş ve hate vegerandin. Di kuştina general Bahtiyar Aydin de ji yek ji beyanên rayedarên dewletê yê din nedigirt û her yek a din derewîn derdixist. Artêse digot: PKK'ê kuştî, Serokkomar digot: Bi şâşî hattîye kuştin. Rojnameyên Tirk ji her wiha hem di şeklê kuştina wî de, hem ji di cihê ku bûyer pêk hatiye de agahiyen ku hev û din nedigirtin didan, her yek tiştekî din digot. Ev yek ji ji bo eşkerekirina bûyerê bes bû û dewlet careke din rûyê xwe yê reş derxiste holê.

PKK ji bi beyanekê daxuyand ku tu têkiliya wan bi kuştina general re tune, li aliye din tu gerilayek ji êrîşî Licê nekiye, jixwe biryar hatiye standin ku, êrîşen bi ser navenda Licê ve, ji ber ku dewlet pişti êrîşan xesareke mezin didin navçeyê, bêne rawestandin.

LICÊ VALA DIBE

Pişti qetliama Licê dewletê derketine derive jî qedexe kribû. Di vê navê de, bi sedan kes ên ku di malen xwe de mabûn ji aliye hêzên dewletê ve hatin girtin. Pişti çend rojê qedexeya derketina derive û rakirina qedexeyê, gel

ber bi gund, bajar û navçeyen din ve dest bi koçberiyê kir. Sêniyê Licê, di nav çend rojan de, ji 10 hezarî, ket 3-4 hezarî. Hêzên dewletê têkili koçberkirina xelkê nakin, ji aliyeke ve daxwaza wan ji jixwe ev bû.

"ALIGIR JÎ DÊ WEKE 'TERORİSTAN' BÊNE CEZAKIRIN

Hikümeta koalisyonê, li gorî fermana generalan, ji bo dijwartirkirina "Qanûna li hember terorê" dest bi xebatan kir. Li gorî vê qanûnê, dê dilwaz û alîgirê PKK'ê ji weke endamên PKK'ê bêne cezakirin, esnafê ku ji bo protestoyan dikanen xwe digirin, dê bêne zîndanîkirin û dikanen wan bêne girtin, partî, sazî, weqf û komeleyen ku destek didene PKK'ê dê bêne girtin û hebûna wan bê musaderekirin. Çapemeni ji, ji vê qanûnê bênesib namîne û ew qanûna anti-demokratik ku jîxwe hebû, tê dijwartir kirin. Li gorî vê, dê di weşanen de, li hember dewletê tu tişt neyê weşandin, dê tu weşan cih nede beyanen PKK'ê, weşanen ku li hember vê qanûnê bilivin ji dê bi cezayen heri giran bêne cezakirin, li gorî qanûna nû cezayen berê tene du qatkirin.

Guherînen qanûnî yên ku li hember çapemeniyê tene kîrin, bi gişti li hember Özgür Gündemê têbikaranîn. Jixwe li gorî qanûnê ku heta niha dihatin meşandin, Özgür Gündem bi milyaran cezayen peran û berpirsiyaren wê ji bi



sedan salan hepisê hatine cezakirin. Nêzîki 20 daweyen girtin jî didomin. Mehkeme ya dawî roja 28'ê Cotmehê bû û bêyî biryarstandinekê hante taloqkirin. Rêvebirê Gündemê girtina rojnameyê wek ihtiîmaleke dûr nabînin.

TEWRA ÇAPEMENIYÊ

Çapemeniya Tirkîyeyê weke her carî piştgiriya xwe ya bi generalan re diyar kir. Hemû politikayen qirkirinê weke her carî pêsi di rojnameyan de tê pêşkêşkirin û dû re ji derbasî jiyanê dibin. Lî vê carê ji carê din cihetir hin tişt ji hene. Dubendiyen di nava hêzên ku dewletê pêk tînin de henin, xwe di rojnameyan de ji diyar dikin. Nivîskarê qorziyên hin rojnameyan, di hin awayan de li hember tewra artêse derdikevin û çareseriya demokratik diparêzin. Ev yek

jî nîşan dide ku çareseriya demokratik her diçe derdikeve pêş û ji dewletê re tu riyen din nahêle.

Pêşveçûnên di warê şerê çekdarî û tewra dewletê de nîşan didin ku dê ev zivistan di

her warî de gelek dijwar derbas bibe. Dê dewlet riya têkîrin û qetliaman hin din ji bidomîne. Bûyera Licê mînaka vê yekê ye, pişti Licê li Ci-zîrê ji êrîşen bi vî rengî pêk hatin û dewlet hemû avahiyen gel da ber gulleyan. Lî ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdi zêde wextê dewletê nemaye û di van politikayen xwe yên hov de, demen xwe yê dawî diji. Di nêzîk de, pişti ku bibînin ji vê politikayê tu encam nagirin, dê ew ji tevî politikayen xwe ji holê rabin û politikayen rasttir bêne kifşirin.

Kongreya yekemîn a YMK'ê

Welat/Almanya - Yekîtiya Mamosteyen Kurd (YMK) ji bo pêkanîna Kongreya xwe bi awayekî fermî belavokekê weşand. YMK bi vê belavoka xwe deng li mamosteyen Kurd dike û rola wan û dîroki bi bîra wan dixe. Em ji belavoka YMK'ê bêkemâsi li jêrê diweşînîn.

'Hevalen hêja! Mamosteyen Kurd!

Di avakirin û pêşvebirina civakê de, zarok her dem dîbin hêvi û armanca pêşerojê. Dibin xwegêriya pêşveçûn û geşbûnê. Kesên ku giyan didin vê xwegêriyê ji, sêlayekî ku civaka mirovahî li ser ava dibe ye. Ev sêla (sêgoşe): Dê, bav û mamoste ye. Riknê avahiya civakî ne. Eger ev rikn bi xwegêri bê avakirin, dê civak ji xwegir be.

Mamosteyen Kurd! Bê çawa tivingen şervanen azadiyê ji bo afirandina jiyanê bê rawestan gul û beybûnan diçin, wilo ji xameya te, ew gul û beybûn bi ava jînê dinoşin, geş û rewan dîkin. Helbet tu ji mîna şervaneke azadiyê xwe berpirsiyarek vî karê mirovahî dîbin û ji bo pêşerojê xwe amade dike û ku delameta xwe hilgiî.

Mîna ku em dizanîn, di sala, di sala 1991'ê de, civîneke fireh ji hêla Yekîtiya Rewşenbîrê Kurdistan (YRWK)'ê ve hat lidarxistin. Bi beşdariya 40 mamosteyen Kurd, li bajarê Boon'ê, payîtexta Almanya, komîteya mamosteyen Kurd hate damezi-

randin. Lî ji ber gelek sedeman, ev komîte di karvaniyê de tu pêşxistin nekirin paya xwe. Lî ser vê bingehê, di mêtûya 20.05.1993'an de ji hêla çend rewşenbîrê welatparêz ve ciynek hat lidarxitin. Bi armanca nûkirina vê komîteyê, di ciyînê de biryar hat standin ku bi navê Yekîtiya Mamosteyen Kurd (YMK) ev xebat xwe nû bîke. Ji bo ku bersiva demê bide, pişti xebateke dirêj, hem di nav gel, hem di nav mamosteyan de karê xwe gihande encameke baş. Di Kongreya YRWK'ê ya sêyemîn de ji, biryar hat standin ku Yekîtiya Mamosteyen Kurd bi fermî ava bibe. Li ser vê bingehê komîteyek ji bo vê xebatê hat avakirin. Ev komîte ket amadekariyên dirêj ji bo lidarxitina kongreya damezirandin. Ev kongre dê di mêtûya 20.11.1993'an de, li bajarê Brunschweige bê lidarxistin.

Em xwe ji bo kongreya YMK ya yekemîn amade bikin.

Mamosteyen Kurd!

Çavên dê û bavên Kurdan, li hatin û derhatina te ye. Çavên zarokên Kurd ku bi hêviyan tîji ne, bixêrhatinê didine te. Kurdistanê şerîn dengê te yê zelal dixwaze. Ew deng ji, mîna çekeke azadîxwaz e di meydana perwerdehiyê de şervan û têkoşer e. Serkevîna kongreya YMK ya yekemîn ji, girêdayî dilsozî û welatparêziya te ye."

Bersiva DEP'ê jîbo aştiyê

'Em piştgirê hewldanê aşîxwaz in'

Partiya Demorasiyê (DEP) serlêdana nevîskarê îslamî İsmâîl Nacar bi awayekê erêni bersivand. Demeke berê li ser navê hînek rewşenbîrê îslamî, nevîskar İsmâîl Nacar bi nameyekê serî li DEP'ê dabû ku, piştgiriya xebata wan ji bo rawestînina şer bikin. Di nameyê de hatibû goitîn ku, ger pêwist be ji bo ku xwîn neyê rijandin dê biçin cem Abdullah Öcalan ji.

DEP, pişti nîrxandineke navendî biryarek erêni stand û Cîgirê Serokê Giştî yê DEP'ê Murat Bozlak roja 27'ê Cotmehê bi nameyekê bersivda vê serîlêdarê. Bozlak di nameyê de dadixuyîne ku, ew li pişti hemû hewldanê bidestxistina aştiyê û pêkanîna biratiya herdu gelan in. Murat Bozlak bersiva partiya xwe wiha didomîne: "Ger xebateke bi vî rengî bi destê kesekî bi tenê ji çê bibe, ew xebatek bi rûmet e û em li pişti wî kesî ne. Em di mijara avakirina biratiya gelên me û çareserkirina pirsgirêka Kurdi de, bi şeweyeke siyasi hemfîkir in".

Afreta Kurd û Afrodîta Yewnanî

Niwa Hebîb

Di Kurmanciya Jérîn (Soranî) de peyva "afret" di şuna peyva "jin" an ji peyva "pîrek" a Kurmanciya Jorîn de tê bikaranîn. Peyva "afret" bi giştî ji bo zayenda mî ye û peyva "jin" ji, ji bo pîreka zewicandî tê gotin.

Di van salen dawî de, gotegot û gengeşiyek di nav rewşenbîrên Kurdîn Başûr de dest pê kiriye ku, peyva "afret" neyê bikaranîn. Ji ber ku dibêjin ev peyv ji peyvên "efrit" (dêw) û "ewret" (organê zayendî ya mîkî) hatiye. Hin ji dibêjin ku, ev peyv di zimanê Tirkî de tê bikaranîn û di wateya pîrekê de ye. Lewma dibe ku, bi Tirkî be. Ev kîşmekê li ser peyva "afret" li başûrê Kurdistanê bû sedemê gelşekê, li ser navê rîxistina "Yekîtiya Jinan". Niha li başûrê welêt du rîxistinê jinan heine, yek jê bi navê "Yekîtiya Jinan" û ya din ji bi navê "Yekîtiya Afret" e.

Alîgirêne peyva "afret" di destê wan de tu belgeyên pêselmin ên zanistî nîn in ku, bersiva neyarêne "afret" bidin. Her wiha neyarêne peyva "afret" ji nikarin bi awayekî zanistî ramana xwe bidin îsbatkîrin. Ev duberîti bûye sebebê ku, ew herdu yekîtiyê jinan hev negirin û destê piştgiriyê dirêji hev nekin. Di havîna 1992'yan de ji Parlementoya Kurdistanê çend civîn li ser vê rewşê kirin, lê negihan tu encamekê.

Ev duberîti bûye sebebê ku, ew herdu yekîtiyê jinan hev negirin û destê piştgiriyê dirêji hev nekin. Di havîna 1992'yan de ji Parlementoya Kurdistanê çend civîn li ser vê rewşê kirin, lê negihan tu encamekê.

Em li vir dixwazin li ser peyva "afret" hin tişt binivîsin. Heke em

Alîgirêne peyva "afret" di destê wan de tu belgeyên pêselmin ên zanistî nîn in ku, bersiva neyarêne "afret" bidin. Her wiha neyarêne peyva "afret" ji nikarin bi awayekî zanistî ramana xwe bidin îsbatkîrin. Ev duberîti bûye sebebê ku, ew herdu yekîtiyê jinan hev negirin û destê piştgiriyê dirêji hev nekin. Di havîna 1992'yan de ji Parlementoya Kurdistanê çend civîn li ser vê rewşê kirin, lê negihan tu encamekê.

lê binihêrin dibînin ku peyva afret a Kurdî û peyva "Afrodît" a Yewnanîya Kevin ji aliyê şewe (şekl) û wate ve nêzîkî hev in. Efsaneyê kevin ên Yewnanî dibêjin ku, rojek ji rojan firîste (melek) zarokeke biçük di nav kefa pêla avê de dibînin. Ev zarok hildidin, dîbin binê deryayê xwedî dîkin, ta ku di dawiyê de dibe xwedanê bedewiyê û navê wê dibe "Afrodît" (Venus)*.

Ev efsane dibêjin ku, Afrodît bi wateya "The foam born" a İngilîzî ye ku bi Kurdî tê wateya "keça di nav avê de ji diya xwe bûye", yanê keça kefa avê.

Her wiha çavkaniyê kevin dibêjin ku, Afrodît xwedana bereketa çandîniyê (zireet) bûye, li Rojhîlat. Dîsa tê gotin ku, ji Fînîkê (ji rex Sûri) çûye Yewnanîstanê.

Di vê vekolinê de du tişt ji bo me derdikevin ronahiyê.

1-Mezopotamyaya Jorîn, weletê Kurdan cihê herî kevin e ku, lê çandîni hatiye kirin. Di vê mijarê de gelek belgeyên arkeolojik bi dest hatin xistin. Dibe ku, ew mirovîn li Mezopotamyayê jiyane gelek efsaneyê wan ên li ser

çandîni (kişt û kal) û zeviyê hebin.

2-Afrodît ku pîreka xwedanê bedewiyê ye, gelek nêzîkî afreta Kurdî ye ku, bi wateya pîrekê ye. Lî heke em koka peyva "Afrodît" vekolin, ji bo me diyar dibe ku, ew peyvên gihane hev û peyva "Afrodît" pêk anîne, hîn di zimanê me de hene:

Afrodît-Keça kefa avê

Af-av

Firo-şîrê sewala nû zayı, ku ew ji her kef e

Dît-dot (keç)

Di zaravayê Kurdî de "dêt", "diwêt" û "dot" di wateya "keç" û "qîz" de tê bikaranîn.

Hersê peyvên "av", "firo" û "dît" ku peyva "Afrodît" pêkanîne bi tenê di zimanê Kurdî de tê dîtin, lê ne di zimanekî din de. Ev rastî û Rojhîlatbûyîna efsaneyâ "Afrodît" me digihîne encama ku di hîmê xwe de efsaneyeyeke Kurdî û bi zimanê Kurdî bûye û peyva "afret", peyveke Kurdî ya xwerû ye.

*Venus bûye navê stêrkekê ku bi Kurdî jê re dibêjin "Nahid".

Werger: Niwa Hebîb,
Zana Farqînî



Peykera Yezdana Evin û Bedewiyê Afrodît, bi destê Kallimakros b. z. di qîrnê 5. de hatiye çêkirin.

Jana Gel û danasîna Mehmet Uzun

Jêhat Serheng

Pirtûka İbrahim Ehmed a giranbuha, Jana Gel, di navbenra salen 1950-54'an de, bi zaravayê Soranî li Kurdistanâ Başûr hatiye nivîsin. Lî mixabin pirtûk, heta sala 1970-71'yan maye bal Dr. Kemal Fuad. Dr. Kemal Fuad, pirtûk wînda kiriye. Di sala 1970'yan de pirtûk hatiye ditin û hatiye belavkirin. Pişt re Elisher pirtûk wergerandiye zaravayê Kurmancî.

Di wergêre de çend cewtiyên teknîkî hene. Lî pirtûk ji aliyê ziman û edebiyatê ve, esereke bêhempa ye. Di wan rojêne edebiyata Kurdî hej ji nû ve destpêkirî de, İbrahim Ehmed, romanekê gelek rind afirandiye. Bi taybetî ji aliyê ziman ve pirtûk gelek bedew e. Teknîka romanê di pirtûka xwe de bi hunermendî bi kar anîye. Lî tiştê herî balkêş ew e ku, dema mirov pirtûkê dixwîne dibêje qey İbrahim Ehmed, rewşa İro ya Kurdistanâ Bakur anîye ziman. Rewşa rewşenbîr û ronakbîrên Kurdîn Tirkîyeyê wek rewşa qehremanen romana Jana Gel'in. Bi rastî, ev rojêne ji nû ve em li vir dijîn, İbrahim Ehmed, pêşîya niha cil salan di salen 1954'an de dîtiye û di romana xwe de bi awayekî hûnermendî nivîsiye.



İbrahim Ehmed, romanekê gelek rind afirandiye. Bi taybetî teknîka romanê di pirtûka xwe de bi hunermendî bi kar anîye. Lî tiştê herî balkêş ew e ku, dema mirov pirtûkê dixwîne dibêje qey İbrahim Ehmed, rewşa İro ya Kurdistanâ Bakur anîye ziman. Rewşa rewşenbîr û ronakbîrên Kurdîn Tirkîyeyê wek rewşa qehremanen romana Jana Gel'in. Bi rastî, ev rojêne ji nû ve em li vir dijîn, İbrahim Ehmed, pêşîya niha cil salan di salen 1954'an de dîtiye.

Lî mixabin, li ser bergê pirtûkê çend gotinê nivîskar Mehmet Uzun hene. Mehmet Uzun li gorî dîtina xwe pirtûk daye nasîn. Li gorî min di van rîzîkîn Mehmet Uzun de tê dîtin ku, wî pirtûk baş venekolaye. Lewre, M. Uzun di pêşîya gotinê xwe de behsa bûyeren di romanê de derbasbûyi, dike. Di nav bûyeren de ji behsa Cezayîr û şoreşa wî wextî li nav Cezayîrê dike. Ü demen li Cezayîr derbasbûyi li gor M. Uzun ketine nav demen Kurdistanê. Lî weki me gotî M. Uzun Pirtûk baş venekolaye. Lewre ne gotina Cezayîr, ne ji Şoreşa Cezayîrê di pirtûkê de bi yek rîzîkî ji nîn e. Bûyer li Kurdistanê dest pê dike û li Kurdistanê ji kuta dibe. Bi taybetî ji şerê na-

bera şoresserên Kurd û Iraqlî nîşan di-de. İbrahim Ehmed bûyeren ku li ser malbatekê bihûrîne bi zimanekî edebî tîne ziman. Di naveroka pirtûkê de tê dîtin ku, nivîskar ji psîkolojiya insan baş fêm dike. Ev teknîk ji, ji bo romanekê pêşîya 40 sali hatî nivîsin bi rastî tiştî zehf baş e. Lewre roman bi hemû aliyênen xwe ve romanekê modern e. Lî divê xwendevan vê yekê ji bide ber çavên xwe ku, roman ji zû ve hatiye nivîsin û nimûneyekê romana Kurdi ya herî kevn e. Pirtûk, di nav edebiyata Kurdî de xwedî cihêkî pîr taybetî û girîng e. Dema roman hatî belavkirin li Iraqlî, ji alî hîkûmetê ve hatiye qedexekirin. Lî disa ji xwendevan bi dest xistine û xwendine. Ji lew re nivîskar pêñuseke şoresser bi kar anîye. Xwendevanen şoresser ji pirtûk ji bo xwe wek rîber dîtine. M. Uzun di nivîsa xwe de behsa gelek quisûr û cewtiyên girîng ji aliyê teknîka romanê ve kiriye. Rastiya vê nîrînê encebi lînîrîna pirtûka M. Uzun ya herî tê zanîn Siya Evinê derdikeve holê. Ji lew re pirtûka M. Uzun Siya Evinê ji bili romanê dişibe her tiştî. Vê carê pêşîye gasinê di çavên xwe de, fermo!.. Em ci bibêjin? Qenc e Mehmet Uzun careke din pirtûkâ İbrahim Ehmed bixwîne û baş li ser wê bifilkire.

Mîzahvanê bi nav û deng: Keremê Kor

M. Zahîr Kayan.

Keremê Kor mîzahvanyekî (qewlikbêj) xweşnas e. der hegê Keremê Kor de me di rojnameya Ozgür Gündemê de nivîsarek wesandibû (Sal 1, Hejmar 234, meha Gulanê 1993, rûpelê Kültü-sanat'ê). Di wê xebatê de berhemên Keremê Kor nehatibûn nîvisin. Her wekî me di wê nîvisa xwe de rê û şopa Keremê Kor dabû xuyan. Em dê niha di vê xebata xwe de jî berhemeke Keremê Kor pêşkêşî xwendevanan bikin, a Fatê. Ev berhem hemû hunerên Keremê Kor derdixe holê û numûneyên mîzahî yên gelê Kurd dide xuyakirin.

Kerem dibêje: "Mala min li Ebexê Aşê Kerra ye. Di biniya mala me de du mal hen e: Yek Xaca ye, yek Bizirxan e. Çawa dibêjim wisan e wele... Yek di Xaca de heye pêncsed pezê wî henin, lê bêkiras e. Xwe jî wisa muzir e, hê tav nade avê li ser xelqê dibirre. Wî çû av li bser xelqê birî, lêxistin muzir kuştin."

Kerem dibêje: "Qeyme çûme Xaca Min rê li hev pêça bi qulaça Min nihîri jinek wê de tê Bejin û balê mêze kir Li spî û kêca"

Jinik Heyderî ye, Kerem Sêberî ye Got: "Oxir be." Min got: "Oxira xêrê be."

-Mal ku ye? Min got: "Li Aşê Ke-rra."

-Navê te bi xêr? Min got: "Quran wê pirsa min bike." Min got: "Dayê navê min Elî, ku nebe dexeli, ya jar ya qeli, Kerem û Fatê teze li hev alî."

Got: "Birayê Elî tu Kerem nas dikî?"

Min got: "Wele hema cînarê min e, derê me yek e, rengê me yek e, ava reş li çavê xwe bike, terkê ji vî şexsî me-ke. Jinik ji dê û bavê xwe ve ker e fêmnake."

Got: "Ne Kerem li ser axaler û beglera distirê?"

Min got: "Dayê Kerem li ser mala mirovan, cameriya mirovan, li dem û



Keremê Kor çiqaş bi nav salan ve diçe mîzahvaniya wî xurttir dibe

dezgehêni mirovan dînihêre dibêje..."

Got: "Wele mîrê min hatiye kuştin, tu çûyî destê xwe li rûyên xwe dayne bibêje wî kurê kerê bira were?"

Ez jî ber sekînîme, resma wê dikşînim haaa..."

Min giot: "Dayê ew kurê kerê ez im, qîza kerê jî tu yi."

Got: "Qusûra min bibexisîne."

Min got: "Naa.. Ezê ji te re dêrekî bibirim hez bikî xwe rakişîne, hez bikî xwe dakişîne."

Ew nexşê wê dikşîne. Lê jinik wisa bedew e ji qelaxê kifş nabe, niha jî li ber çavê min ranabe.

-Navê jinikê çî ye?

-Fatê

-Deyne nav hêtê Berê wê bide pêtê Heta ber kêtê Ci bibirî ew lê tê Destkêş bi xwe tê Repe rep li pey tê

Min got: "Çığa bise zefta min lê tê." Em ketine sivderekê, sivdereke reş î

dirêj e, jinik dimeşe Kerem vedireşe. Kerem ku dimeşe jinik vedireşe. Kumeteke kapreş e him orxe ye, him qafreş e, her dinya jî rûreş e, va hela hê nexş e haa.. Em çûne orta malê çû

kincê mîrê xwe anî, cileka kevne parîti li ser kulfika tendûrê ji min re danî.

Min got: "Ez gora bavê wê nim, ji Tehranhe ta Stenbolê digerim. Cem axeleran, begleran rûdinim vê bêbavê çû cilik danî. Tubihêez gorî cilikê jê re bibêjim."

Fatê got: "Apo?"

Min got: "Cane."

Got: "Ser seran û ser çavan."

Min got: "Ser çavser serî Te kurê kerê kiriye pişt derî Ez jî benda te me, xwe bide wî hemberî

Qîza wî kerî..."

Got: "Apo porê min kur bike min tu nas nekirî."

Min got: "Na hê nexş in li pey tê, ji Xwedê ve eyan e çû kincê mîrê xwe anî. Min kinc li erdê bilind kir. Xîncî herdu mil û pastiya tiştek nîn e Ne wis-tukurr e, ne dibire. Paşa li pêşiyê dibihure."

Jinik li xwe dixe, Kerem bire bire. Çığa ji me kurê kî dimire, xwazî ew xwe ragire.

Min kinc avetîne ser milê xwe, heft bend in, çar bendaran wê Keremê bibêje, sê bendaran wê Fatê bibêje. Dora Fatê ye, teşîya xwe dirîse:

Êêê wezê xwe bi qurbana te bikim Tu ser çavê min heft bavê min re hafî

Heta niha çîma nedihatî Bendekê biavêje ser bejina zirav Reisê vî welatî...

(Pozê xwe li qûna xwe dide digirî) Min got: "Weyila diya minê, wêga dorâ min e."

Mehrûmê çû me Xaca li bilinciya Serê wî dane ser têra ginciya Dora wî bû şinge şinga zebaniya Sinbelê wî bi dêla kerê ve hevaliya Kerê bîst û çar zîtik avî neqetiya Bejna zirav li ser basmê welgeriya Got: "Apo."

Min got: "Ha."

Got: "Ez bizinekê bidime te here."

Min got: "Tu pezê xwe, dewarê xwe bidi min welehi ez naçim. Kela min tije bûye şîna birê xwe dikim daa." (Jinik kinca ha kaş dike, ez ha kaş dikim.)

-Mehrûmê çû me Xaca dar û dirî Sed deh gund temam di gorê de birî Got: "Apo tu didi çeran?"

Min got: "Na fatha dixwînim..."

-Çûme Xaca li nik e Axa parsek bû, ısal xortik e Navê jîna wî Fatik e Çûye Kerem li Kewşen teklîf dike Cila kerê di bin de çar qat dike Kincê axê li ber vedike Herd mişka mîna du bekçîyan ber radike

Dibê: "Apo gunê min wistûyên te be Tu axê di her teyîbê de qeyd bike way..."

Fatê giriya û got: "Weyla mala bavê min şewitye

Xaca li her sê gira

Bira li pey malxo

Du kurê min bimira

Rûyê min reş bûya

Min Kerem neaniya vira

Bira ji malxo re nebûya kirêt

Vî bêbavî dêla te kiriye dêla dêlegura wî..."

Min got: "Dayê va kincê te Ev alem birî gora bavê te, mîrê te Ew bizina tu dîbêjî min da xatirê te."

Di çend hejmarêne me yên sala çûyî de me navêne deverêne Kurdistanê yên ku hatine guhertin bi Tirkî û Kurdi weşandibûn. Di vê hejmarê û yên pêşîya me de jî car caran emê vi karî bidomînin. Di vê hejmarê de emê navêne gunden Elkê (Beytuşbab) pêşkêşî we bikin. Elkê navçeya Culemêrgê ye.

Elkê (Beytuşbab)

Akarsu	Isirvan
İkili	Simkatê
Ovacık	Tengahanan
Yamaçaltı	Guvapervarî
Düzkavak	Kendalan
Gölgeli	Melîha
Yandere	Kacetekeles
Aşağıdere	Gelîjêr
Hisarkapı	B. Şebaba Kevin
Başaran	Cemînîzar
Ayvalı	Barzan
Tepebaşı	Balakan
Akagil	Cemêberûj
Badamlı	Hartaxlı

NAVÊN DEVERAN

Bölücek	Pirosan	Erenler	Gelyük	Pirincli	Çemhaskî
Değirmenli	Aşkan	Kömür	Komir	Kavaklı	İşkevtarës
Ballı	Zevyan	Kurşunlu	Kelhacangiraxa	Kayaaltı	Berkevir
Günyüzü	Melîse	Dağaltı	Tivor	Toptepe	Kaçitbahrem
Boğazören	Kitir	Gökçe	Evrek	Tuzluca	Tuzluca
Akagil	Bégavga	Karapınar	Kanîreş	Konuklu	Gêhjük
Akat	Köpê	Güneykaya	Batê	Ayrancı	Berîpank
Konuklu	Güsünî	Ilicak	Hemam	Uzungeçit	Dirahêni
Besâğaç	Hemkan	Kovankaya	Mehrî	Yeşilöz	Feraşîn
Altınsu	Avazer	Üçkardeş	Ahyan	Aşağıulaş	Heculyanajêri
Bolağac	Bişî	Geçit Delarî	Hozî	KöklüQesir	
Otlak	Derastûri	Ayrım	Piran	Toprak	Basekan
Cevizagaç	Gezneh	Yassitaş	Koyunoba	Yk.Erdem	Hankajorî
			Mutluca	Dağtepe	Girêkendalan
			Kaspiyanış	AşağıErdem	Aşakajêri
			Mezra	CatakKûrkan	
			Bayraklı	Toptaşı	Hindirûnis
			Taşkıran	Yurtbaşı	Xerabailyas
			Buğdaylı	Yk.ulâş	Hecîulyanajêri
			Hüsrevpaşa		
			Ortalı		
			Yaşar		
			Sögütçe		
			Oymakaya		
			Taşarası		
			Dolî		
			Bırıman		

Serpêhatiyek ji şerê germ

Em diherine dîlanê

Sakîne

Me ji her gavî cihêtir û bi zinditir dest bi roja nû kir. Girîngiya rojê ji aliyê me hemûyan ve dihate zanîn û kîfeke nehêni di hundirê me de xwe dilivand.

Îro heval bi zorê saet ber bi 11'ê rojê ve ji xewê hisyar bûn. Bêxewî û westeya çend rojan bi vî awayî ji ser xwe avêtin. Her kesé ku hisyar dibû, pêşî silavek dida rojê û pişt re bi çavên xwe delalî û xwesikbûna deverê miz dida, jê hez dikir.

Darêñ gûzan bi gewde û guliyên xwe yên mezin ve ber bi esmanên bal' û pal ve hildîkişîyan, darêñ mazîyan, ên spindaran, ên sêv û hermiyan ji. Gûlî û pelên wan wisa gurr bûn ku, nedîhiştin tîrêjîn rojê ji nav wan biserîn û axê ramûsin.

Em li kendalekî li seriya gundekî ne. Ji jor ve li wî gundê ku, di geliyek kûr i Kela Memê de bi cih bûye, dînihîrin. Gundî li hev dicin û têñ, bi jêhatinek û şarezi-



ziwakirin. Her tişt di rê de dixuye. Çek têñ kontrolkirin, ger tê de terbîneke bîçuk ji hebe, dibe sebebî mirinê. Ku çek çiqas bê paqîkirin xweşik dibe, çiqas bê bikaranîn ewqas ji jê tê hez-

Dema ku ji dûrî ve dûringa hevdîtinê her diçû kêm dibû, me ji xwe berî gelî da. Hemû heval tu dibêjî qey nameşin, difirîn. Berê ji bi saetekê em di vê riyê de çûbûbûn, niha ez li saetê dimêzînim ku me bi nîv saetekê ev rî kudandiye.

EM LI BENDA DENG IN

Em di nav bêdengiyeke bêhempa de ber bi hedefa xwe ve dicin. Gundê ku em dê biavêjine serê, gundekî çeteyan (cerdevan) e. Nêzîkî 80 kesî çekdar û 2 mete-rîsîn (kozik) wan hene. Ev gundê ku li ser Eşîra Mala Beyro ye, gelek caran di operasyonan de rîberîtiyê ji dijimin re kirine û ew kun bi kun gerandine. Divê me hesabê vê yekê ji wan bipirsîya, niha em dicin ku em ji

wan bipirsin.

Şev tarî, bêheyv û stêrk ji naçîrûsîn; zenûn in. Hevalen ku di tariyê de wek reşahîyê dixuyê pirr bi zor ji hev têñ derxistin. Kom bi kom heval ji hev qetian û li çeperastê belav bûn. Belê herkes dihere cihê xwe. Em koma êrîşê ne, em dê herine gund. Komek ji hevalan li aliyê Seqirikê, ya din ji li hêla Helal û Şêxan kemîn danîn. Komek ji, ji bo parêziya giştî li serê gir ma. Koma êrîşê ji, di nav xwe de li sê koman hate belavkirin û em ber bi jêr û jorê gund ve meşyan. Em di kozikên xwe de bi cih bûn. Bi heyecaneke mezin li benda dengê B-7'ê ya koma êrîşê ne. Saniye dibin deqîqe, deqîqe dibûn saet. Ez li saetê dînihîrim ji min kirî ku naxebite, ne saniye ne deqîqe dilive. Em deng dipêñ,

dipêñ, ev e dengê B-7'ê ji zinarê jorîn olan da. Di demekê kurt de her der bû weke qiyametê.

Em tev di pey deng de li kozika ku ji berê ve hatibû nîşankirin, dimêzin. Çete nikarin keysa tegandina gulle-yekê ji bi dest bixin. Pişte berxwedaneke kin deng ji kozikan hate birrîn. Çend hevalen me bi gullebarankirina me ya li ser kozikan re, bi telandinê xwe ber bi kozikan ve kişandin. Bi birîna teqîna çekêne me re wan bombezîn desten xwe avêtin kozikan. Herdu mete-rîs ji edî di destê me de bûn. Ji wê derê bombe û roket ber bi malen cerdevanan ve dihatin avêtin.

PÊTA AGIR DIFIRIYA

Edî şeva tarî ronî bû. Di şevê de gulleýen sor wek pêta agir li hewayê difirîyan. Çekén B-7 ran gurmînî û zimmîniyê ji zinaran dianîn. Gulleýen BCK yan rengekî din didan vê dîlanê. Gelek ne domiya. Lewre berxwedan zû şikiya. Bêtîrûs bûn. Ji kozikan dirûsmeya "Biji Serok Apo" dihate bihistin. Belê di nav bi hezaran dengê berik û gulleýen de me ev deng dibihîst. Lewre em wê gavê bijeriya pêjnê ya herî hesas dijiyan. Belê di nava bi hezaran dengan de ew dengê ku em li hêviyê bûn kete guhê me. Ü me dest bi vê yekê kiribû, em dê biqedînin ji. Agir berî ka ü giyayan ji hatibû dayîn û pêta agir bi bayê re dileyîzî. Pêt tarî çirandibû. Em dengê te ji dibihîzin "Agir". Edî em dê vekişin.

Werger: Zana Farqîni

kirin. Ev e me ew xweşik û bedew kirin, ji işev bi şûn ve em dê hin bêhtir ji wan hez bikin. Belê pirr pirr pişte çend saetan em dê bi rî kevin.

HEDEFA ME CEHŞIK IN

Ev e dema ku em hemû li hêviyê bûn, hat. Em li hev dicivin. Ciîna beriya livbaziyê. Plan dê were xwendin. Îro bi vê livbaziyê dê terzê tevgera me biguhere ku, ev e 20 roj in em bi tenê dimeşîyan. Şer me dicoşîne, dili-vîne, jiyanê bi me dide hez-kirin. Navê şer ji di nav lîvîn me de vediguhere bisîrîneke şîrîn. Şer, bisîrîneke zindî. Şer ku tu çiqas bi heq bî xweş e. Çiqas tu bi inisiyatîf bî ewqas te xurttir dike. tu çiqas xurt bî ewqas ji moralê te zêde dike. Di şerekî de bimoralbûna artêse, nîvê serkeftinê ye. Ev e em niha bi heq in, xurt in û xwedîmoral in. Nexwe em dê bi ser bikevin.

Saet bû 8'ê êvarê. Gewriyek xwe berî terzê tevgerê te

Dîsa hemû. hevalen me pişî çayeke tarî dest bi xebata xwe ya rojê dikin. Pişî xwarinê, ez nizanim xwarin xuînî ye, taştê ye an firavîn e; hevalan dest bi paqîkirina çek, gulle û jarjorêñ xwe kirin. Çek hatin bidonkirin û

WEŞANXANEYA ZAGROS

Li we difikire, niha ji çar berhemên bi Kurdî bi buhayekî şkandî pêşkêşî we xwendevanan dike.

✓ Kela Dimdimê:	30.000 LT
✓ Evîna Welat:	70.000 LT
✓ Pêşeriya hewisîna zimanê Kurdî:	30.000 LT
✓ Rêzimanê Kurdî:	50.000 LT

Her çar pirtûk tevî hev 180.000 Lîrayê Tirk dike.
Lê ji bo we ji buhayê wan % 35 dadixe û bi tenê 117.000 LT li we dike mal.

Navnîşana xwestinê:

Zagros Yayınları
Nuruosmaniye cad. Atay apt.
No: 5/12 Cağaloğlu/ İstanbul Tlf: 512 29 17 – 528 61 16

Ji Zerdeş re name

Belê Mîrza
Zerdeş; ka
çavêن xwe
veke, bala xwe bidê,
ji zêdetirê neviyên te
çend qewm mane li
dûrî nîstiman.

**Ey seyda! Bi rastî an
em ne tu war in, an
ji di tebietê (xwaza-
yê) de xeletî henin.
Çima? Di kîjan
zimanî de navê
çêlikê kerê wiha bi
qîmet e? Li kîjan
welati xulamtiya ji
neyar re wisa bi
rûmet e? Kîjan cinsê
jîndaran goştê laşê
birayên xwe
difiroşe? Te ev awa
qetbihîstiye?**

Seyît Çiya

(Zerdeş bi destûra herdu
nirxên "başılı" û "aşılı" dest
bi Zend Awesta dike.) Tê bîra
te, wexta ku te çav li Med-
yayê da, erd û esman ji destê
bêbavêñ Persiyan dinaliya?
Welat bûbû zîndaneke mezin,
qewmê te bi girî û bi gazin
bû. Tarî geriyabû li ser Arya.
Teyran hêlin çenêdikir, şalûr
nedîsqiyan.

Lê, rohniyek mabû di dilê
te de! Hûrmiz herdem di
xewnen te de rê nîşan dida

Ey hosteyê diyalektikê, za-
nayê yekîtiya dijberan! Tê bî-
ra te, te ji min re digot hin ci-
rok û efsane carina: "Gilga-
mişek hebû. Lawikê Sumerî,
hiş û aqil windakirî, li pey
dermanê mirinê digerî." Ew
hikumdarêñ behr û asiman-
nan, mezinê qewm û eşî-
ran, bi gotineke wî çiya dihe-
jin, çem diçikîn bi fermaneke
wî.

Lê milêñ Axrîmanê dirêjtir,
mar û xenzîrên wî zêdetir
bûn. Iro Gilgamiş di nav rû-
pelên pirtûkan, di dîroka
bêdawî de, yek caran li
mêvaniya mijûlan e! Lê Axrî-
man? Ew her dem di nîv
dilê ïnsanan û di zerreyê tar-
yan de ye.

"Xwedîyê cîhanê, Rom, E-
cem û em bûn" digot Ce-
gerxwîn. Milê me li aliyeke li
Behra Hezer, li aliye din li Çi-
yayê Munzûrê bû. Welatê me
bi bereket, bextê me vekirf
bû.

Ka te digot, axa me axa
wekheviyê ye? Ka te digot, a-
qîdeya ïnsan ji hevîre başîtiyê
ye? Tê bîra te siya Geliyê



Zagros û Qendîl? Ew hêlinê
dil?

Te li ser papîrozan, li ser
bircen kelehan, li ser kevirê
çol û pesaran nedînivîsand
ku, jiyan şer e, ronahî û tarî
ye?

Çirîskêñ lûleyên di destê
zarokên xwe de dibînî ey
Zerdeş!!! Tu dilê wan dibînî?
Ku iro barê dînyayê li ser
milê wan e! Ey Zerdeş! Niha
li ku ye qewmê te? Ka zanîn-
geh û milkên te? Medresê û
warêñ te? Kanî û behrêñ te?

Ey Zerdeşte Arî, pîrekâlê
Kelhorî! Kanêne ew feqiyê-
te? Sofî û derwêşen te?

Qırn geriyan, guherîn navê
qewm û devaran. Însan cûn
ersê e'la, dest avêtin stérkan,
li binê behran geriyan, hesin
danîn ser maseyan, ew belav
kirin li atoman.

Lê zanayê ilman, mezinê şar-
istaniyan, ew sedsal, xera-
biyê dernexistin ji mejîyan.
Belangazê wan dîsa Hurmiz,
prensesa wan ma Axrîman.

Dîsa digazinin neviyên te:
Ka Hurmiz? Agir dîbarîne li
ser serê me Axrîmana xera-
biyan.

Belê Mîrza Zerdeş; ka
çavên xwe veke, bala xwe
bidê, ji zêdetirê neviyên te
çend qewm mane li dûrî nîstiman.

Ey seyda! Bi rastî yan em

ne tu war in, an ji di tebietê
(xwazayê) de xeletî henin. Çi-
ma? Di kîjan zimanî de navê
çêlikê kerê wiha bi qîmet e?
Li kîjan welati xulamtiya ji
neyar re wisa bi rûmet e? Kî-
jan cinsê jîndaran goştê laşê
birayên xwe difiroşe? Te ev
awa qetbihîstiye?

Lê... (rastiyêñ jiyanê piştî
gotina "lê" têñ) hevalê Zerdeş!
Iro di nav qewmê te de,
hinek ji neviyên te, pirtûk û
zanyariyêñ te, gotin û salixêñ
te tînîn bîra te!

Ew, ew heval, niha li ber
siyên geliyêñ te, ew şowal-
yeyên şaristaniyan, ges dikin
agiran. Ne çêlikêñ keran, ne
xulamîn neyaran, ne ji dolêñ
Hulagû û Axrîmanan nikarin
serî deynin bi wan.

Belê hevalê Zerdeş; xera-
biyêñ hemû hêzan, tariyêñ
hemû zemanan kom bûne li
ser serê wan, ew têñ
ceribandin bi agiran. Ka
çavên xwe veke, bala xwe bi-
de wan çavagiran!

Te dit gotinek heye, Cab-
ral dibêje: "Dema ew (neyar)
hatin, pirtûkên wan û axa
me hebû, niha axa wan lê
pirtûka me heye".

AZADÎ



Abdurrahman Durre

Şêxo û Rêxo

Du mirov rastî hev têñ; yek ji yekî dipirse: "Navê
te ci ye?" Yê din dibêje: "Navê min Şêxo ye."
Car din dipirse: "Xalê Rêxo navê bavê te ci
ye?" Mêrik dikene dibêje: "Kekê min te ci navê min
saff kir, içar dora navê bavê min?"

Zeyneba Zer (Tansu Çiller) ji piştî ji Viyanayê ve-
geriya got ku, der heqê pîrsa Kurdan de mimkûn e ku,
ew ji wekî İspanya, modela Baskê bidin ber xwe. Belê
ev derewa wê cih negirt û faşist û yobazên TC'ê yên
siyasi û leşkerî li hemberî wê derketin. Pîrsa modela
Baskê jê kirin û wekî wi mirovê ku navê "Şêxo-Rêxo"
tevlîhev kir, Çiller ji "BASK"ê kir "kask" û gote ku, min
tiştekî wisa ne gotiye û ez nizanim ka Modela Baskê
ci ye. Bi dû wê re ji Cîgirê wê yî hêja(!) Serokê SHP'a
kemalist Murat Karayalçın, zîrektiye xwe da nişan û li
hember modela Baskê, modela Kaskê, yanî mo-
dela Tirk avête holê, "Bask" kir "kask" û "Şêxo"
ji kir "Rêxo", bi vi awayi ji rewş
bi tevahî lewitan. Bi rastî ji
herdyan re ji "Sed maşelâh û
dused aferin". Pirr rind dan is-
batkirin ku, Tirkî beramberî
hemû dînyayê ye.

Li Hambürgê
ez cum firoşge-
ha rojnamefiro-
şan ku, rojna-
meya Özgür
Gündemî bistî-
nim. Heciyekî nas rastî min hat û keniya, got: "Seyda!
Gelo tu dizanî ev Bask ci ye? Di Gündemî de dinivî-
se Karayalçın gotiye ku, ne Bask, le Modela Tirk rast
e. Tu bi Xwedê bikî ev ci dibêjin? Bask ci ye, modela
Tirk ci ye?" Min ji Hecî re çiroka Şêxo û Rêxo got. He-
cî keniya, lava li min kir, got: "Em herin qehwexaneya
Camiya Şêx Seîd û qasekê sohbet bikin." Em cûn û
rûniştin. Me dîte ku, çend xorten Kurd ji hatin û li ser
maseyeke din rûniştin û li ser beyana Karayalçın dest
bi guftûgoyê kirin. Yek ji wan digot: "Ev Karayalçın e,
ci ziqûm e, Lazekî faşist û kemalist e, hê ji Çiller ji fa-
şistit û nîjadperesttir e." Yê din ji digot: "Ma ci dibêjin,
bila bibêjin, model, modela Apo ye." Yekî bi rih ji li
wan guhdarî dîkir, got: "Li gorî baweriya min ji, mode-
la rast modela Quranê ye." Û guftûgoya wan tundir
bû. Hecî bangî wan kir û gote wan ku, werin li seyda
guhdarî bikin, bila ew ji we re izaha modelan bike. Li
ser banga Hecî hemû hatin maseya me û ez ji wan re
axivîm. Bi kurtî min ji wan re qala Modela Baskê kir
ku, Bask gelekî di nav sînorân İspanya de ye û ji bo
mafîn xwe demekî dirêj têkoşin daye, dû re ji hikû-
meta İspanya bi wan re li hev hatiye û mafîn wan ên
siyasi û çandî daye wan. Herdu gel pirsgirêkê di nav-
bera xwe de çareser kirine.

Li ser modela Tirkan ji min ji xortan re diyar kir ku,
li gorî vê modelê Kurd tune ne, herkes Tirk e, kî ku
bibêje "Ez Kurd im" xayîn e. Pratîka wê ji kuştin, ta-
lankirin, işkence, wehşet û kokbirrin e. Modela Apo ji,
modela gerîla ye. Li hember zilm û zora ku li ser gelê
Kurd tê meşandin şoreş, serhildan û şerî çekdarî û
siyasi ye. Armanca wî ji azadiya gelê Kurd û bidest-
xistina mafîn wan ên ïnsanî, demokratî û neteweyî
ye.

Piştî ku min modela Apo bi kurtî wiha izah kir, ew
mirovê bi rih ji cih rabû û wiha got: "Bi Xwedê modela
Quranê ji vê dixwaze." Li ser vê gotina wî em ji keni-
yan û rabûn.

Rewşa rewşenbîrê Başûr

Behlolî

Rewşenbîrê Kurd li başûrê Kurdistanê piştî Serhildana 1991 an, mîna tevahîya hemû kategoriyên cîvakê, hîviyên xwe bi guherîn bin-gehîn ve girê dabûn. Çavêن wan li wê yekê bû ku, reş û spî dê ji hev û din diyar bibin û dê bikaribin kul û derdê salêñ bindestiyê biavêjin û kaniyên hîzr û bîrêñ xwe yêñ azad bipeqînin. Lî niha dibînîn ku, her ew tas û her ew hemam e. Reş, spî dixuye, sipî ji her di êş û azarêñ xwe de dinale, disa di holê de berbiçav nabe. Belê, xwediyêñ qelemêñ bêxêr, qelemêñ ku her dem hîzr û bîrêñ jehirkirî yêñ rejîma Baas direşandin, qelemêñ ji bili pesn û fortêñ bejn û bala Eflaq (Damezrênerê partiya Baas) nedînîsîn, ji pesnê kiryarêñ wan ên hovane pêvetir tiştek nedigotin, niha ji her ew in, rewşenbîrê resmî û cihêñ nehej (sabit) girtine.

Rast e, hatine efükirin û milet li gunhêñ wan boriye, kesek çavşorîyê bi lêborîna wan naake, lê wan li hember vê lêborînê ci kirine? Rojekê ji rexne li xwe kirine? Nêxêr: boriyêñ xwe diparêzin, herdem bi tayê xurt digirin, dilê wan her bi qirêj û gemar e, bêbawerî ne, hejhejok in, kesanetiya xwe winda kirine, qelemêñ xwe ji bo du qurişan difiroşin, geh sor in, geh zer in, geh ji şîn in, lê belê her reş in û qelemfiroş in.

Ji bo ku, em bêhtir rewşa rewşenbîrê ji nézik ve bibînin, fermo guh bidin wan, kaçı dibêjin:

Fuad Mecîd Mîsrî di hevdîtina xwe ya di gel rojnameya Özgür Gündemê de, der barê

Lome, gîlî û gazinêñ rewşenbîrân pirr in, rewşa wan i aborî ne baş e. Sererastkirina rewşê dixwazin, rexneyêñ wan hene. Ji rewşenbîrêñ bêalî re derfet dixwazin. Dibêjin ku her çiqas bi çavşorî li me binêrin, planêñ terorkirina me deynin û nanê şevê ji ji me re nebe, em dest ji rola xwe ya dîrokî bernadin.

vê yekê de raya xwe diyar dike û dibêje: "Heta qelemfiroş di qadê de bin, rewşa rewşenbîrân baştır nabe. Ger tu rûpelê her rojnameyekê, an kovarakê vekî, seyra her kena-lekê televizyonê bikî, nav û şeklê wan dê bikeve berçavê te ku, bi dirêjahiya çend salan xizmeta rejîm û ideolojiya Baas kirine, pesna diktatoriyê dane, bi vî awayî ji xwe bilind kirine. Niha ji xwe avêtine ser wêye û hunerê, ji bo rêvebirina pilanêñ dijmin. Niha ji her ew in edib, rewşenbîr û karbî destê fermî. Ew ên ku, rejîma Baas ew digirtin li dû wan digeriya, nanbirr dikirin, mi-sext dikirin û derd dixwarin, hê ji di wî halî de dijîn û dinâlin. Rêveberêñ perwerde, ra-gihadin û zanîftgehan her ew in, ew ên ku bi destê rejîmê hatibûn ser kar". Nivîskar Fuad ji bo rewşa aboriya rewşenbîrê ji wiha got: "Bi raya min dijwariya jîyanê û rewşa aborî, ne bi tenê egara paşvemayîna rewşenbîrêñ Kurd e. Rast e, nivîskarêñ Kurd wek ên hemû xelkêñ din, li dû pariyeke nanê xwe digerin. Ger jiyanekî wisa bi dest nexe ku, dikaribe binivîse, kar bike, dê çawa berhem biafiñîn, dê ci hengê xwe perwerde bike, hisyariya xwe bi pêş bixe. Ji aliyejî din ve divê pisûleya partiyekê de berîka wî de hebe ku, heta bikaribe nasnameya hunermendi, an ji nivîskarî wer bigire".

Fuad Mecîd Mîsrî, wiha

dirêjahiya bi gotina xwe dide: "Bi dîtinê min tu qeware, qalibên neliv û çespandin ji bo rewşenbîrîtyê nîn in, ji rewşenbîrîtyê re, wek tiştêñ din sixleteki jê re heye; rast e sixleteki wî hisyari ye, belê hemû ew têgîhiştinêñ ku rewşenbîr pişta xwe pê girê dide diyar dikin ku, ka ci cure rewşenbîr e. Dibe ku, ser bi dergatî be, dibe ku rewşenbîrê çîna burjûvazî be, dibe ku ji bo serkeftina sistema siyasi û civakî ya sermayedariyê binivîse, dibe ku, bi çîna karkeran re be; rewşenbîrê rast ewe ku, ew ji wek karkeran ji berhemêñ xwe naxwe".

Li ser rola rewşenbîrêñ ser-bixwe ên li derveyî partiyêñ Kurdistanî Fuad Mecîd wiha got: "Ez ji hikûmeta herêmê dipirsim, heta niha ci derfet ji rewşenbîrêñ neremî re berhev û peyda kirine? Çend nimûne ji berhemêñ wan dîtine? Ji bilê vê yekê di karê rewşenbîr de kemasî nîn e. İro ew xwedî tu alîkariyêñ berbiçav nîn in, nikarin berhemêñ xwe çap bikin, tu dem û dezgeh alîkariya wan nakin. Belê ez dibêjim bila çend plan ji bo terorkirina wan bêñ da-nîn, bila bi çend çavşorî li wan mîze bikin, bila nanê şevê ji nîn bin; ew ji rola xe ya dîrokî venagerin û dest jê bernadin".

Bهادین Norî nivîskar û sekreterê berê yê Partiya Kominist a Iraqê ye, di peyiñîna xwe ya digel Özgür Gündemê

de dîtinê xwe bi vî awayî diyar dike: "Rewşenbîrêñ me gelek bi gazin in, gîlî dîkin, bi giştî ji ji rewşa xwe ya aborî digazinin. Ev aliyejî gazinêñ wan e, li aliyejî din gazina wan a mezin ew e ku, ew qelemêñ ku di xizmeta rejîma Baas de bûn, niha ji zedetîrî rewşenbîrîñ din ketine karêñ rojnameyeriya Kurdistanî, qelemêñ azad ku di wê demê de derfet tune bûn ku, binivisin, niha ji ji pişt guh ve hatine avêtin. Li gorî zarîna min, berhemêñ rewşenbîrêñ me kêm in û lawaz in, ji ber herdu sedeman."

Sernîvîskarê kovara Serhildan Star Ali der barê vê rewşê de ji rojnameya Welat re dîtinê xwe pêşkêş dike: "Ez bi hemû dengê xwe dibêjim ku, pêdiviya me bi paksaziye heye. Bereyê (Eniya) Kurdistanî di sala 1993'an de efuya gişî ilan kir, lê ev wê yekê diyar naake ku, em ew nivîskar û hunermendêñ ku he-ta doh li dijî miletê Kurd xirabî dikirin, dê cihêñ bilind bigirin û cihêñ giřing bikevin destê wan. Berevajîyê wê, divê li mala xwe rûnîn da ku kes dengê xwe ji wan re neke. Nabe ku bêñ rêza yeke-mîn û kesen layîq ji wan ci-han bêne dûrxistin, bi taybeti ji ci cihêñ hesas û giřing. Ev yek ji bo kê rast e? Ji bo ew kesen ku di partiyen de cih girtine, lê di hemû partiyen de ew kes nîn in, her li hinan hene, ez hez nakim navê

wan bidim, bi rasti hin parfü bûne merkeza mirovîn xerab".

Li ser pêşveçûna rewşa rewşenbîrîtyê Star wiha got: "Piştî serhildanê û heta niha, bi awayekî gişî rewşa rewşenbîrîtyê bi pêş ve çûye. Lî ne di hemû derfetan de, ev ji ji ber belavbûna rewşenbîrân li hêzîn siyasi ye. Her wisa paşvemana berhemêñ rewşenbîrân li hin deveren başûrê Kurdistanî, vedigere ser hinde rewşenbîrêñ ku guherîne baş wernegirtine. Ji aliyejî din ve, tesîra hin faktoran li ser hin kesan heye. Ji bo nimûne, rewşa rewşenbîrân li devera Behdînan paşkeftir e, lewre li Behdînan pêwendîrîş eşîri xurt in û geleb bi ser ketine."

Diyar e ku paqijkirina hemû dezgeh û cihêñ giřing ji mirovîn cilek, durû, bertîlx-war, ew kesen ku dijayedîya qelemêñ paqij û xweragir kîrin, di dema rejîma Baas de cehşqelem bûn, tiştekî pêdivî û fer e, lewre bicihanîna yasa û peywîrîn nû, bêyî guherîna mirovîn xerab karekî giran e.


Her wiha pêwest e ku, rewşenbîrêñ welatparêz, dilsoz û Kurdperwer cihêñ xwe yêñ minasib bigirin, an ji dê nave-roka şoreşê û ramana wê beravîj bibe.

Hêjâyî gotinê ye ku, 54 kes ji rewşenbîrêñ Kurd, li ba-jarê Silamaniyê roja 13.2.1993'yan de belgenâmeyeke bi imze şandîn ji Parlement Kurdistanî re, Civata Wezîran ên Herêma Kurdistanî, Wezîre Rewşenbîrî û serokatiyêñ giş partî û rîkxistinîn eniya Kurdistanî. Di belgenameyê de daxwaza paksaziya bizava rewşenbîrî û Kurdi kîribûn ji bo berjewendiya gişti û bicihanîna rolêñ xwe yêñ dirokî.

XACEPIRS

Çepeast: 1-Wenekarekî navdar i ji başûrê welêt ku di wêne de tê dîtin. Rojnameya me di çend hejmarêñ berê de hevpeyvînêkê pê re cêkiribû 2-Ard, ji genim tê cêkirin/ Navê Kovara Celadet Bedirxan ê nemir ku, cara pêşin bi alfabeysa Kurdi ya Latîni li Şamî hatiye weşandin/ Kin 3-Ji bo êzîdiyan cihékî pirr pîroz e/ Girtin, dadan 4-Zerya, cihê ku erd û esman dijîhiye hev/ Lezet/ Ji kesê biçuk re tê gotin, qicik 5-Vekişîna las-tîkê ku ji hev kaş dibe/ Nogandîna bale-firan bî awayekî serserkî 6-Beyreq/ Navê sewalekê ku pê cot tê kîrin 7-Hînek/ Bi Ingilîzi "na" 8-Navê rojekê/ Mirovî bêbedeb 9-Kesê beredayî, eware 10-Navê kincê ku bûk di dîlanê de li xwe dike/ Plageya Yewnanistanê
Serejér: 1-Spasdarî 2-Cihê ku lê fêkî, zerzewat û qût tê firotan/ Kinî, inyadî 3-Navê bajarekî Swîsreyê ku lê peyma-nek li ser parîkirina Kurdistanê hatiye cêkirin/ Bi Ingilîzi kingotina "Ouenc" 4-Baneşanek/ Bi Tirkî "dest"/ Baneşane-ke ku di maneya "gelo" û "ma"yê de ji tê gotin 5-Bayê ku havînê ji reşahîyê ber bi deryayê ve diçe/ Hêmaya pla-qeya Tirkîyeyê 6-Cinavka kesane ya ye-keheimara ji desteya sîyemin/ Erebe, wesîteyin bicuk 7-Madde/ Navê amû-reke muzikê 8-Li Asyaya Navîn navê golekê/ Cihê gerîneka avê 9-Hêmaya pla-qeya Almanyayê 10-Kesê ji Iraqê

Amadekar: Rasto Zilanî



11-Ji cehşikê hêstirê re tê gotin 12-Celebek ji pûtê sewalan

BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA CÜYÎ

Çepeast: 1-Yalçın Küçük 2-Arı/ Sersal 3-Sar/ Opa/ Mk 4-Ez/ Eskî/ Erd 5-Mîro/ Eş 6-Ol/ Doz 7-Nav/ Pîr 8-Sîm/ Aş 9-At/ Rohnî 10-Sîdar
Serejér: 1-Yasemîn/ As 2-Arazî/ Aşî 3-Lîr/ Rovî 4-Pol/ Mra 5-Isô/ Or 6-Nependî 7-Kras/ Oran 8-Üs/ Kêz/ Şîn 9-Çam 10-Ülke 11-Rû 12-Sed

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li derive: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkiyê: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopyeyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
3 meh	60.000
6 meh	120.000
12 meh	240.000
	30 DM
	60 DM
	120 DM

Şervanekî biçük: Agir

Jîr Dilovan

Li nêzîkî Kerboran
Gundek digotin Meran

Ew gund xwedî bîst
mal e
Li ser kaş bin newal e

Dibistanek lê hebû
Lê mamoste tune bû

Zaro'w zêçen gundiyan
Diçine ber kerian

Keriyên berx û karan
Ber golik û dewaran

Lawekî pirr jîr hebû
Wek çeliyê ziha bû

Nîn e li vî welatî
Kesek wilô jêhatî

Bi navê xwe ye Bekir
Lê ew dibêjê "Agir"

Agir mîna hevalan
Diçe ber berx û karan

Hevalên wî li çolê
Dilîzin gog û holê

Lê ew li ber tibaran
Tim rûdine bi raman

Çavên xwe berdide dûr
Wan gelî'w newalên
kûr

Dîsa wek hemû gava
Berê xwe dabû Mava

Ji xwe re got: "Çi rind i
Çiyakî serbilind i

Bo gerîlayên delal
Tu bûye mesken û
mal.

Tu bo wan gund û
bajar
Tu yî parêzgeh û war.

Lê em li gundan dîl in
Sertewandî rezîl in.

Her roj leşkerên Tirkan
Xwefiroşen cerdevan.

Digirine ser gundan
Bi zilm û zor û lêdan.

Dibê: "An bibin xayîn
An jî bêjiyan û jîn"

Me navê wilô jiyan
Li bin destan perîşan

Lê divê bo me xîret
Serbilindî bi rûmet

Mirineke şîrhelal
Qet nabin bi milk û mal

Ji lew re ku ez dîl bim
Bi vê rewşê qayîl bim



Li ber dîwarên gunda
Emê tev bibin winda

Li dijî wan kedxwaran
Ezê jî bibim şervan

Dibim şervanekî biçük
Li ser çiyan mîna çûk

Çiyayên Mava bedew
Edî em rabûn ji xew

Heft xwezî bi wê
hengê
Ser te têkevîm cengê

Her roj karê wî ev e
Wî ne roj û ne şev e

Hişê wî qet nemaye
Dildarê gerîla ye

Rojekê fecrê veda
Hê hemû kes di xew

Cerdevan û leşkeran
Li navâ Gund hildêran

Kal û pîr û zarok tev
Li meydanê dane hev

Agir berdane malan
Xesp kirin terş û talan

Birin firax û alav
Hebûn û zêr û dirav

Beri leşker cerdevan
Xwe çend dikin pîrekan

Guhê wan d'seqitînin
Guharan diderînin

Dest davêjin stûyê wan
Jê dikin ristê zêran

Sercerdevanê bêar
Di destan de hişkedar

Got: "Ji we bêminet im
Va ez li vir dewlet im

An hûnê bi me re bin
An jî, ji Gund derkeyin

Edî ji bo we jiyan
Wê her bibe taristan"

Li nav zarakan Agir
Hêdîka serî rakir

Li rewşa wîna nêrî
Ji hêrsa xwe da girî

Mîna çûk di sîngê de
Dilê wî li ser hev lê da

Ser dilê wî werimî

Çav bûn cirûsk û rimî

Ji xwe re got: "Ya
Xuda
Ka tu ketiye ku da

Tu dibînî bê guman
Vê zilm û zora giran"

Leşker û cerdevan
Gelek kirin bin çavan

Bi carekê Gund berdan
Berê xwe dan
Kerboran

Ew kesê ku li Gund
man
Belav bûn li malan

Tiştên ku neşewitîn
Dane hev û deranîn

Lê mixabin mane rût
Béalav zîlf û zelüt

Gundî tev de man
neçar
Firotin pez û dewar

Teva dan soz û pey
man
Got: "An mirin an jiyan

Emê xwe ser hev radin
Gundê xwe qet
bernadîn

Mîrin bêserbilindî
Gund nemîne
bêxwedî"

Èvarekê şervanên rind
Xafil xwe gihandin
gund

Wan şervanên pirr
çeleng
Jîr û egît û leheng

Dilêñ gundiyan ku sar
Kirin wek roja dijwar

Gundî bi wan kîfxwes
bûn
Mîna gulên sor, ges
bûn

Rûniştin bi dilşahî
Heta berê sibehî

Servanekî wek sersot
Ji tevan re wiha got:

"Ev axa bav û kalan
Dê bi xwînê bê avdan

Em xwînê nerijîn
Serxwebûnê nabînîn

Guh nedîn terş û talan
Bêjîn: "Kanî
Kurdistan?"

Bila çîlpî tazî bin
Tenê serfirazî bin"

Berê sibehê rabûn
Ji gund derketin û cûn

Agir ji mal bi dizî
Kete dû wan û bezi

Xwe berdan geliyên

Agir diçê dûre dûr

Jê re ketin nava rez
Berê xwe dane Kupraz

Di binya gund re meşîn
Ber bi Mava hilkişîn

Zor da lingê xwe Agir
Bi dengê bilind bang
kir

Şervan li xwe zivirîn
Li dera deng tê nêrîn

Tev ketin pişta dîwêr
Bala xwe xweş dane
jêr

Çekêñ xwe siwar kirin
Xwe jî bo şer kar kirin

Hat, nêzîkî li wan kir
Tevan nêrîn ku Agir

Ji cih rabûn bi lezê
Gotin: "Tu ci dixwazî?"

Got: 'Naxwazim tu
tiştan
Ezê jî bibim şervan

Temenê min nenêrin
Ka keleşê hilgirim"

Teva gotin: "Biqere
Bi lez li gund vegere

Lew tu gelek biçük i
Tu carî debar nakî"

Agir bi hêrsek mezin
Got: "Ka em tev
bibezin

Ku nebim bi ser we re
Nika bêjin vegere"

Gotin: "Ne bez tenê ye
Her gav mirin li rî ye

Ku tu neçî mixabin
Emê te bi zor bibin"

Got: "Mafê we tune ye
Partiya bavê we ye?"

Nêrîn ku pê nikarin
Gotin: "Bimeş em
herin"

Agirê sêzdeh salî
Bîçük û pirr delalî

Bo doza welatê xwe
Keleş avêt milê xwe

Bû mîrxasekî çeleng
Jê belav bû nav û
deng

Tika yeme nekujin!

رسو کراسیدا له گانه چار پریبه کهی (حمدکنو) او (حمدکنو)

زیارت مان نمینمیره.
به عذر حال، من به کنیکم لعله همراه روز جاریله دوست نبا
شایان بشکله خودن شرکت کنی و بسما کردیست و هم زمان بهلام
ناشتوانم بینه همگ هم کانی مردی نیکی بمن توانی کورد به
بله چاروی زن و مندالیه و درینه پدر گولمه خلنانی خوبین
ده کری.

نارام چون قدمو ولی بکم کاتن ملا به کی هزار دبر سی به
نویزی شهروزه پر له گفلن چنلاوی کولان و خوبی نخوی زینکل
ده کری.

هیچسان لستان نادی تنهای معملا کوشن و رینکی هاتسونه
صدام شوش مده کدن. نیمه، هیچ یاد گار نیکی نشوشنان له گلدن ندم
پیاودا نیمه.

دو پنی مدنیلیکسان لیزه شعهد کرد و پیشتر گفتگویی کردند اینکه نجف مومنی نیشنامانی که بدر له سالنی،
پیشتر پیش دنگنکن نداشت دار کردندان به دهن اسما خودنایان،
سمی هزار مرز فرود دنگنکن نداشت دار کردند و در موقوفی روندیده و کومونیستسان شعبید
کرد، دوای شعده ده رکای روزنامه ای کسان داده، کسانمان
هموری له کموده همراهی کدنا کرد که ناومن ناوه (نزا) دید
دیسرو کراس کو له ده دوه و هر بده ناوه بانگسان ده گعله،
خوبیشانو بینگانه دوان نموده نیمه دیسرو کرا اسی.
دو شمسی بزد توسموی کور را پیشسان خود لمسه راهه
دیسرو کراس بدوه به پله بکه هم، مافی رهای کورد بدوه
در نهاده پیشودا دامونه، همشت هزار سرفقه بارانیه
شونبره که سالی ۱۸۱ ایمان، ۱۸۲ هزاره که نیفمالسان ده
هزار شمهيدلو پهلا که تو شو لی قعواه که عالم بجهمان، رژه
رهه که کمله کنچی دای راهپریسی ۱۹۱ ایمان، نشو همصوره
هزارانه مان کرد به گاو گردوئی زیبائی دیسرو کراسی تعلق
شونکی تر.
وابسو به دو سالنی نسیم کوره استانه ناز داره کمان به
بیر پاومانهه تالان ده کر یکو پنهه دهگ ناکهین، زر بعی گمل
رزو له دوای رزو پیشتنی تو ندتر ده کاو همدنیکش رزو له
رزو نیمه عالم بندیکمان پیش که کنونه، بلام نیشهه ونک ناکهین،
دو رای رزو پیشتنیان شلتر ده کنونه، بلام نیشهه ونک ناکهین،
هزارانه مان که همچو کوره دنکی دهوده زردو دو کسکی کرد و دو
هزارانه مانی به پیشواری پل دو هاوسنی پل دو و دوک ندو
لیسیه مارازی ی سوپای عیزاق در کراموون.
همهود مدان پرسپاری (۷۳۷) او وناسنین، سلام سمو
بر اینمان ک ندو کات له دوروه بودو له گمل را پهین د دواي
نزهه مان سر بازي ی سوپای عیزاق ده کراموون.
لیسیه ماروزنستسان بله دوکی کوره استانی عیزاق
دوای شواد سوونی شهري عیزاق - نیشان له ۸
۱۹۸۸/۷/۷
رز پشمی عیزاق لپسورد ردنی بذر ندو گنجبه کوره اندور کرد که
سلامی سال بدور سر بر زیان ره زن کردند و ده لک کوئن
ریشدانی مالهه دانیشبوون پا پیشمر گه نسروند، کنم
تیغهورده به دو پیباری زماره (۷۳۷) او (۷۳۶) کی تعبجه و منی
دیسرو کرا پاتری بعمسوو ده پچونه بموره، ندم پیباران به دیبان

**Ev niûis bi destê
ronakbireki ji
Kurdistana Başur
hatiye niûsandin.
Tê de bûyer û tiştêm
pirr ecêb hene.
Bêguhertin bi tipêr
Erebi em pêşkêsi
xuendevanên xue**



West

- Li ser navé iMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Şahîbî) Zübeyîr Aydar
 - Berpîrişyarê Nîvîşaran (Yazî İşleri Müdürü) Mazzhar Günbat
 - Navîşan (Adres) Nûruosmâniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
 - Berpîrişyarîya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saat 11.00-16.00)
 - Fax: (49) 228-630715
 - Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkiin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ